Xalid Xalid-KOÇÎ

# BERÊ XWE DANEK DI KARÊT NETEBAYÊN PIRSA KURDÎ Û PÊDIVIYATIYÊN NUHE

Xalid Xalid-KOÇÎ

# BERÊ XWE DANEK DI KARÊT NETEBAYÊN PIRSA KURDÎ Û PÊDIVIYATIYÊN NUHE

# Berê xwe danek di karêt netebayên pirsakurdîûpêdiviyatiyênnuhe

Xalid Xalid-Koçî

Çapa Oricînal:
Nazratun fî t-tanaqudatî l-lati tahkumu l-qadiy-ya l-kurdiy-ya wa mustalzamatî l-wad'î r-rahini. 1989

**Xalid Xalid-Koçî**

Werger: Ji erebî bo kurdî (tîpên erebî).
**Cehfer Mayî**

*Wergêr: Bo tîpên latînî*
*Abdulwahid Bavî*

*Çapa yekem bi kurdî*
*ISBN: 91-630-1238 - 3*

*Copyright. Khalid Khalid-Koçî*
*Printid in Sweden*
*Stockholm 1992*

*Sättning och tryck :*
*APEC - Tryck och Förlag*
*Box: 3318 , 163 03 SPÅNGA -SWEDEN.*

*Mafê çapkirinê parastiye*

# NAVEROK


-Sivke gotînek jî wergêrî .................................. 7
-Pêş gotin ................................................ 9
-Siruştê gellê kurd û netebagên wî ........................ 11
-Siruştê bizava azadîxwaza neteweyî ya kurdî .......... 16
-Netebayên ku kar di bizava azadîxwaza kurdî da diken.19
-Cîhankirina pirsa kurdî û peywendîyêt Kurdistanê
di gel derve. ............................................... 28
-Stiraticiyet û pêdiviyatên nuhe ........................... 36
-Got û bêja riyalîst royî û idyalist royî .................... 57
-Jêder ..................................................... 74
-Tîvarêz ................................................... 76
- Ferhengok, ji bo bi sanahî kirina peyvên giran û nuh .77
-Berhemên nivîsarî ....................................... 80

*Ji zarokên Kurdistanê re pêşkêşe.*

# "Sivke gotinek ji wergêrî"

Gelek salên giran û nexweş biser gelê mede barîn û dîsa nuhe jî ev gele her yêlibin barê herê nexweşê sitem kariyê,rênc û êşa dikêşit.

Ev nivêsîna Seydayê Xalid nivêsî pêngaveke bo helsengandina salên barî û demê nuhe... Hewildaneke bo dest nîşankirina birînên gelê Kurd û Pedivyatiyên nojdariya wan birîna.

Bi min pêngavek pirr hêjaye, û pêdiviye her Kurdek bixwinit. Hêjatiya vê pêngavê pêtir di hindê daye hewildaneke bo Xilolekirina dîwarê tirsê, tirsa bê eger ji nivêsîn û helsengandinê.

Nivêsevanî gelek hizrên giring yê divê nivêsinêde derbirîn û diyar kirin. Lê wekî min daxwaza wî bi supa sivê pesend kirî û biryar day vê nivêsînê ji erebiyê wergêr me kurdiyê, ména (wate) ew nine ez xudan û helgirê heman bir û bawer û heman hizra me, di bit li gelek ciha hizr û boçanêt me êk nebin. Lê gelek bi fer dizanim em hemî fêrî loqa dîmukrasiyê bikin û baştirîn rengên dîmukrasiyê ewe, xwe nî bikeyn çawan di xwazîn derav û delîvan ji gotin û derbirna hizrêt xwera peyda bikeyn û serbest bêjin û diyar biken. Ez li wê bawerê nînim ( ji ber gelek egera ) rewşenbîrên Kurd bikarin û bizanin rastiya tewaw û bîr û bawerên gogirî û bê kêmasî derbibirin.

Lê disan li wê bawerême her êk ji me dikarit hindekê ji rastiyê û dirustiyê destnişan bikit û bêjit. Û kengî rastî û dirustiyên me hemiya vêk ketin û gehiştine hev û kombone ser êk, hîngê dê xwe di qonaxek bêrincî û gelek başde bibînîn.

Evca ji bo xizmeta pirsa gelê xwe, ji bo nojdarkirina

birîna me ya here bijan û mezin, divêt hestên me diber pirsiyarbin û ne bi tinê rê bideyne hev da hizrêt xwe derbibirîn, lê divê harîkariya hev bikeyn û astenga ji rêya hev ladeyn û cudahiyên li nav bîr û bawer û darêtina hizran ji xwere nekeyne eger bo kuştina vê hulma dîmukrasiyê ya ku hêdî hêdî dinav civaka Kurdistanê de divejit û serhildidet û piç piçe di sexletêt mede diyar dibit.

**Cahfer Mayî**

# Pêşgotin

Ev nivêsîne encamê serborên jîna minin, li nav rêzên bizava azadîxwaza netewê Kurd herweha encamê çendîn seredanên mine bo hemî parçên Kurdistanê, û çavpêkeftin di gel serok û pisporên rêxistinê û kadir û bêlayenan li Kurdistanê û Ewrupa. Dikarim bêjim: ev nivêsîne deng dana êş û janên xelkê kurdistanêye û selîqa hizirkirina wana, kovana derbederi û karesatên here teh û nexweşe.

Bi rastî û dirustî ev nivêsîne perdê ji ser hemî pîlanêt dijminên me dihelînit, ew dijminên Kurdistana me dagîr kirî û xelkê me êxistiye bin darê zordariyê.

Rêzgirtineka gelek mezin min ya hey bo hemî rêxistinên dîmukrasi yên Kurdistanê, yên ku li pay(1) rêk û loqe(2) bîr û bawerên xwe dibicivin û xebatê diken, dijî xwinmêj û dagirkerên Kurdistanê.

Çunkî zor aşkiraye ku ew hemî rêxistin û her êk bi loqa xwe pirr zehmet û êş û azar û nexweşiya dibînin. Sexmeratî serferaziya netewê Kurd, yê herdem zîndû. Netewê ku şiyay (karî) piştî her karesateka bi serde hatî, careka dî xwe li ser pêt xwe bigrit û berdewa miyê bîdit xebat û tê koşîna xwe.

Ez li wê bawerê me ev nivêsîne dê bite egera nerehetî û torebona gelek birayên min yên kurd. Lê ez dibînim serferazî û berjewendiyên gelê me pêdiviye di berî hemî egera bin û bi ser hemî tişta bikevin. Lewma wek Kurdekê dilsoz û bêlayyen ez dibêjim ; "Rastî pêdiviye bihête gotin û nivêsîn bila ya nexweş û tehil jî bît".

Ji ber vê çendê pêdiviye hemî kes bizanin ku ev nivêsîne ne dijî filan mirovî yan bêh van mirovîye yan vî giropi yan giropê heye. Lê ji ber hemyane û bo hemyane.

Ji bo xizmeta pirs û xebata gelê kurde.

Eve rastiyeke hemî xelkê Kurdistanê jî têda dijît, û hewildaneke bo ladana perdan ji ser hemî netebayiyên[3] di nav mede. Çunkî hindî bikin û bêjin rastî êke û nabit du, bo hemî xelkê Kurdistanê ew jî <<Serxwebûn û mafê çare nivêse>> . Ez dê hewildim li bin tirojka zanistîyê û bê layeniyê, wekî ez tê digehim hizrekê derbibrim li ser rewşa gelê Kurd û bizava wî ya neteweyî û bi çavekê vekiri tir berê xwe bidim kartêkirina[4] netebayiyan di nav gelê me û bizava azadîxwaza wîda.

Pirsa kurdî, wek ez tê digehim, pirseka cihanî ye, ji ber hindê şirovekirina min bo vî babetê dê li ser bingehê jîrkariya[5] cihankirina Kêşa Kurdî bît, û diyar kirina çarçova peywendiyên wê yên cîhanî.

Paşî dê hewl dem stratêjîka Kurdî di kolameka berfireh de dest nîşan kem û dê diyar kem kanê çi pêdiviye bihêtekirin di van kawdana[6] da. Herwesa bi nîşan û destnîşan û vebirîn dê çime di dan û standineka dervekiride li navbera (Îdyalîstan) û (Riyalîstan) da.

Pêdiviye em bizanîn niyasîna her nesaxiyeka, şîyanekê didete me ku em bişên çare serîya wê nesaxiyê pê bikeyn. Pêdiviye xwe fêr bikeyne parastinê ji nesaxiyê, da ne kevîne di nav derdê bê dermaniyê da.

*Xalid Xalid-Koçî*

# Siruştê gelê Kurd û netebayên wî

Nuhe Kurditan ya di heyamê(7) borînê(8) da eki dijît, ji derebegiyê bo sermayedariyê(9). Hêsta peywendiyên eşîrî û derebegî karê xwe di behrapêtir ji gundên Kurdistanê da diken. lê peywendiyên sermayedarî (diravdarî) ,destpêkir şîn bûn li salên piştî cengê cihanê yê yekê , piştî karxane û bingehên bazirganî hatine danandin, ji egera biserhelbûna petrolê li Kurdistanê, peywendiyên derebegî li Kurdistanê ne tinê bo vebirina berhemê kariye wekî hindek hizirdiken. Lê her wesa sîstemeke bo diyarkirina erkên cotkarî beramber derebegî, li dwîf (ligor) biryarên derebegî bi xwe, herwesa ji bo diyarkirina behra cotyarî ji layê derebegî ve, yan ji layê Xudanê erdîve.

Çunkî ew sîstem dabeşkirina berhemî divebirît.

Di ser hindêra ku sîstemaka derebegî di Kurdistanêde nî. Lê peywendiyên derebegî di mişene(10). Lewma pêdiviye ev renge peywendiye bihêne wêran kirin. Û zevî û kîlanêt berdirhay û mezin ji Xudanên wan bihêne wergirtin û bihêne dabeş kirin li ser cotyara, da ku kedxwarî nemînin.

Herwesa pêdiviye berkê ji bin pên wan hemî kesa bikêşin ewêt bazirganiyê bi amwir(11) û pêdiviya tên çandinê diken.

Ji aliyekê dîvê pêdiviye karker û cotkar bihêne têgehandin û rewşen bîrkirin û bihêne helandin ji bin penc û çengolên hejariyê. Da bizanin baştir şal di erdê xweda bikin û berhemê xwe mişetir bikin. Ji bo vê çendê divêt kawdanên xweyî(12) yen cotkar û karkeran bihêne hêbandin(13), herwesa kawdanên dervejî(14), daku cotkar bibit xudanê erdê xwe û karker xudanê karê xwe.

Bêy ku hindek yasayên(15) çareserkirina kiştû kaleyê ji

dervey welatî bînin û biser xelkê dadin.

Disan pêdiviye hizr û bîrên karker û cotkaran bihêne pêşxistin bi şalî û komeldariyê(16), birengekê wesa ku bişên beşdariyê di kar û barên şoreşa Kurdî da bikin û jîneka dîmokrasi dinav rêzên şoreşê da bibin ser. Dakû bişên (bikarin) bi hemî erkêt xwe rabin, bi hizreka rewşan, nexasme dest û darêt şoreşê ewin. Lê eger birengekê herho bihêne rêkxistin û bikevne şalî, helbet encam dê yê pelose (17) û nerêk bit.

Çandin û xudankirina pez û çêla tayê here giringe di aboriya Kurdistanêde. Cotyar dibine 70% ê ji xelkê gelê Kurd. Lê hemi yê dibin dilreqiya kevneperistên kurdve dijin. Herwesa yê dibin darê zordariya politîkî û aborî ya ereb û turk û farisanve dinalin.

Peywendiyên derebegî bi rengekê serekî diçerxêt yazdê û diwazdêde şîn bûn. Lê li bin sîbera Osmanîya û farisan berfireh bûn û bihêz ketin.

Piştî cengê cihanî yê yekê derfetek (delîvek) baş bo damezrandina dewleteka kurdî ya serbixwe helket. Lê gunneha vegirtina vî mafê ji kurda dikevîte ser milêt dagirkerêt Engiliz û Fransî û peymana lozan li sala 1923. Herwisa ew gunneh di kevîte ser milêt rijêmêt kevneperist li Iraq ê,Turkiyê, Suriyê û Îranê. Cotyar li Kurdistanê ne twîxeka(18) yekgirtîye. Derebeg û kevne peristên dest helat darve Lê ev azardan û sepandine gelek tîje û dijware li ser milêt cofyarêt hejar. Eveye netebaya here giringe.

Çîna karker li Kurdistanê nu ya çêboy û ev çîne ya du rengêt zordariyê dibînit. Ji alekîve zordariya çinayetî û ji aliyê dîve yaneteweyî, lewma qoçanê û şerenîxê digel politîka rijêmêt dagîr kerên Kurdistanê dikit û ji berhindê pêdiviye xebatê bikin, bo rizgariya xwe ya neteweyî û ya aborî. Dîsan li Kurdistanê hindek karkerên werzî(19) yan

wextî(kafî) yên heyn. Herwesa hindek di nav zevîyêt(20) mîrî de û hindekên dî dikarsaziyên(21) dagîr kirnêde kardikin. Lewma dikevne şerenîxê digel dagirkeran, ji bo rizgarî û azadî û serxwebunê.

Eger em çînên burciwazî yên kurdî digel çînên burciwazîyên turkî û Îraqî û Îranî û Surî berawird(muqarene) bikîn dê bînîn; Çînên burciwazî yên kurdî ji egera lawaziya aboriya xwe gelek di bê hêz û di bê şîyanin. Eve ji encamê politîka dagirkirinê û nedanandina karxanêt mezin li Kurdistanê.

Burciwaziya kurdî ya li pêştir burciwaziya bazirganiye dîsan hindek derebeg yên loqa lêkvekirinê û şol pêkirina pale û cotyara bi dest xwe girtî. Ku boye egera peydakirina peywendiyên derebegî û sermayedariyê. Lê cwîna(22) burciwaziya biçûk dîsan ewjî rênca jêr destîyê dikêşît û ji ber hindê ya şorişgêre û bikarê hişyarkirinê û rêkxistinê radibît bi harîkariya karker û cotkaran.

Cwîneka dîjî li Kurdistanê di hête berçav, ewjî cwîna (sepanan)e. Lê rewşa wan hindî bêjî hind nexweşe. Sepan hêza karê xwe di firoşîte derebegî yan xweyîyê erdî. Ew bizarove, bijin ve di hemî deravade(23), nan û zik(24) şol dikin bêy ku hîç mafên yasayî hebin. Demê şolê xwejî dihêlin, yan ji nav şolî dihêne derkirin, dê xwe bînin xudanên çunînin tîtelêt xwe (cilêt xwe yên kevn û diryay).

Dabeşkirina peywendiyên derebegî û xirvebûna dirav dariyê bûne egera hindê ku cudahiyêt çînayetî kwîrtîr û kwîrtir bibin.

Xudanên mer û malatî, yên xudan erd û zevî, rizîna sîstema eşîrî, medenî kirina qereçan, weha li cotyarî kir yê ku kêm pez hey, weha lê kir ku êdî neşêt pezê xwe li çerwanekî bi çerînit, eger hindek serêt pezî ji pezê xwe nedite xweyîyê çerwanî, fişara(25) burciwaziya neteweyên dese-

latdar, burciwaziya bîrokratî ya erebî û turkî û farisî hêzeka mezintir da biyaniya û peywendiyên derebegî, daku debeşkirina şolî di Kurdistanê da pitir alozî bikevîtê nehêlît bazarê nav xweyî li Kurdistanê bipêş bikevît.

Dîrok nivêsê kurd (Şerefxanê Bedlîsî) wesa diyar dikit, ku berî çerxê çardê çîna serweran û bêçaran di nav gelê kurd da jêk hatine vavartin. Ev çende ta evrûke jî lihindek cîha li Kurdistanê dihête berçav.

Û li dumahiya çerxê nûzdê û destpêka çerxê bîstê sermayê bazirganiyê û (rîbayê) li gelek ciha li Kurdistanê xwe diyar kir.

Ta ku nuha , di nav gelê kurd de (axatî) û (begatî) cihê rêzgirtin û çav pênerabûnê.

Bo nimûne axa dikarît xwîkê(26) danite ser milêt cotkarî di ser wan hemî şolare yên cotkar bo dikit. Wekî zibara yan her şolekê hî û şîyên(27) kurdewarî dikene erk li ser milêt wî. Ev çende pileya(28) dijwariya rênca du ser ya bindestiyê li Kurdistanê diyar dikit. Rênca dûser, carekê ji alê dagîrkerêt paşverûyên biyanîve, û caradî ji alê axayan ve. Û piraniya wan axan xwe firoş û caş bûn xizmeta dujminêt şorişa kurdî dikir.

Û ji bilî van cwîna, dîsan hindek komkêt dî yêt mirova yê li Kurdistanê heyn rênca here mezin û dijwar ya li ser milên wan. wekî şivan û gavan û palên dirwînê. Yan ewên hwîrde şolên destî dikin. Li ser vê bingehê êkgirtina neteweyî ya kurdî nabît û nahete kirin. Eger sîstema derebegî ya eşîrî û burciwaziya bîrukratî nehête têkdan û ji nav birin.

Hindek dîroknivês wesan diyar dikin, ku gelê kurd di heyamê (qonax) bendegiyê(30) da nebariye.

Dîrok wesan diyar naket ku sîstema bendegiyê, wek sîstemek ser bixwe di nav gelê kurd da peyda bibit.

Şamîlov dibêjît: Bendegiyê cihê xweyê diyar dinav gelê kurd da nebu û nebûye renge kê serekî yê çew san kirinê. Egera vê çendê jî ewe, çunkî gelên hev tuxwîb di gel kurda di heyamên bendegiyê da di jiyan û gehiştine gupîtka bendegiyê, û paşî çone di heyamê derebegiyê da.

Ji ber hindê bendegî nebû binyatek bo berhemî. Lê bo harîkarek bo peydabona derebegiyê û rênca wê.

Di karîn bêjîn: Dwîratiya Kurdistanê ji bingehên bazirganiya cîhanî û nepeydabona rê û barêt xweş û baş, û xwe hêlana bi hêviya şivanî û çandina dêmîve bû egera peydabûna peywendiyên eşîrî di heyamêt dîroka Kurdistanê da.

Herwesa êknegirtina peywendiyên aborî ji egera sextî û asêtiya herêmêt Kurdistanê, bû astengek mezin di rêka gelê kurd da, û neşya bixwe hêzeka ramyarî ya êkgirtî ava bikit. Îna bû nêçîrek ya bisanahî û kefte devê dewletên kapîtalîzmê.

Vî rengê sirûştî yê jînê egerêt xwe yêt mezin liser peydabûna çînêt destelatdar di Kurdistanê da hebû.

Îmaratêt kurdî jî, ji egera lawazî û bêçaretiya împiratoriyêt hev tixwîbêt xwe bi hêz û şiyan diketin.

# Siruştê Bizava Azadixwaza Neteweyî Ya Kurdî

Bizava azadîxwaza neteweyî ya kurdî, parçeke ji bizava milletên jêr dest. Ev bizave ya ji hinav û cergêt gelê kurd zay. Wek pêdiviyek dîrokî û pir babet(32). Li dumahîka nîva êkê ji çerxê nozdê û bi pêş ket û hev çerx bû, wek bizavek nîştiman perwer û dîmukrasî li destpêka çerxê bîstê, di gel bizava (meşrutî) li nav dewleta Osmanî û mil bi milê bizavên neteweyî yêt gelên Turk (îtîhad û tereqî) û gelên ereb (Elmunteda Eledebî). Armancêt bizawa azadîxwaza rizgarkirina gelê kurde ji bindestî û zordariyê û Kedxwariyê û dagîrkirinê û bi destve înana hîvî û daxazên gelê kurd. Da ku bişêt mafê çarenivîsa xwe bi serbestî bi destê xwe bigrît. Herwesa bizaveka sorişgêriye dijî Çewsandin û împiryalîzmê û rijêmêt kevneperist yêt Kurdistan dagîrkirî, û dijî hemî hêzêt kevne perest yêt ku dibine asteng di riya pêşveçona civakî da.

Ev bizave dîsan bizaveke pêşketinxwaz, dixazît milletê kurd ji rih û rîşalan bêxîte di guharîna da piştî rizgar bûnê.

Herwesa bizava azadîxwaza neteweyî ya gelê kurd, bizavek dîmukrasiye. Dest û darêt wê çînêt rêncberin. Yêt ku sexmeratî êkgirtina Kurdistanê û nehêlana zordariyê ji dil bizivin. Bizaveke bi leş û giyan û diyalektîk di gel pirsêt azadî û pêşkeftina komelayetî tekel dibît.

Bizava azadixwaza gelê kurd, dengê gelekê parçe parçe kiriye li ser erdê wî, dengê Kurdistaneka dagîr kiriye û dabeşkiriye. Ev pirse, pirsa kurdî, pirsek neteweyî, nîştimanî, dîmokrasî, ramyariye. Egerêt xwe yêt komelayetî û rewşenbîrî û derûnî (saykolojî) û rwîmetî yêt heyn. Pêtir ji hindê ku diyarkirina karekê taybetî yê dîrokî bît, wek turkkirin û erebkirin û fariskirinê. Şerenîxêt neteweyî di dîtina

marksismêda, ne tişteke ji bilî hindek rwîdanêt nevberketî di şerenîxa çînayetî da. Yanîk û kef peqîşkin(33) fser şerenixa çinayetî di kevin.

(Ernist Mandêla) di kitêba xwe da (Got û bêja milletî û Çinê) berperê 39 ê da di bêjît:

Zordariya neteweyî di hête rulîdan ji egera nebona dîmukrasiyê û runîştina burciwaziyê di kursîka biratiyêda.Lê ez li wê bawerê me ku pêdiviye cudahiyek li navbera netewêt zordar û netewêt jêrdest bihête naskirin,.

Netewê Kurd netewek jêr deste lewma pêdiviye harîkariya wî bihêt kirin da ku azad bibît û bibîte xweyî xudanê çarenivîsa xwe li hemî parçêt Kurdistanê.

Pêdiviye dilêt xwe gelek bi yasayêt otonomî xweş nekeyn. Eger li vê dewleta sosyalîzmî yan liwê dewleta sermayedarî hatine sazkirin û derêxistin. Çunkî otonimî dirwîşmeke, pirsa kurdî veditezînit û astenga di êxîte di rêya yekbûna gelê kurd da çi li bin diraşmêt çep rew yan rast rew bît.

Gelê kurd gelek caran dijî dagîr keran yê raboy û gelek şoriş yêt kirîn û hemî dema dest û darêt wan şorişa her zehmetkêş û rêncber û pale bûne.

Lê şorişên kurdî rêkxistineka baş û stiratijîyeteka gogirandî nebû.Ji bilî ku gelek serek û serkêşêt wan şorişa xwe bidest dijminan ve berdida.

Lê di serhindêra, ewhemî şoriş parçekin ji dirok û kul û kovanêt gelê me û zimanê daxwaz û hîvîyêt azadiyê ne. Ji bindestî û zordariyê.

Bizava azadîxwaza neteweyî ya gelê kurd eger bi dirustî mirov lê binêrît dê bînît gelek netebayên giştî kar tê di ken û mirov neşêt wesa bisanahî wan hemî netebaya jêk vavêrît. Yan xwe di serre bi havêjît, ji ber gelek egerêt xwemalî û biyanî.

Lê eger neşên xwe di ser wan netebayara gav bideyn. Pêşkeftin peyda nabit,çunkî pêşkeftin ji egera netebayan û êkgirtina dijatîyêt wan peyda dibît. Lê kengî sûrbuneka êk girtî ya rewşenbîr û hizirtîj peyda bû, dê şêt rê bo wan hemî giriftariya bînît.

Aya ew neteba çine?

# Netebayên ku kar di bizava azadîxwaza kurdî da diken

Gelek destgahêt partayetiyê yan yêt millî, yêt berniyas û nepenî, herwesa gelek mirov, hizir diken. Ku bitinê biyanîne bwîne egera heriftin û têk çona şorişên kurdî yêt hev çerx. Lê ez bi xwe li wê bawerê nînim. Ez wesa hizir dikem ku dibît biyanî jî egerek bin ji egera. Lê neher binasêt wan bi tinên e. Ji ber ku egera biyaniya bixwe jî encamê gelek egerêt nav şorişê bixwene.

Wekî xirabkarêt biyanî di sistî û lawazî û helingiftinêt şorişê şareza bûn di gel têkelbûn helbet hingê şoriş dê kevîte bin dirbêt here biêş taku di herifît û diroxît.

Baweriya me ewe ku xudanê malê ye dergehê xwe bo kesê li dergehî didet vediket. Fere li ser xudanê malê bizanit ew çi kese li dergehê wî didet. Berî dergehî veket. Pêdiviye pirsyar biket tu kî? Helbet dê guh li bersivê bît (Ezim) lê kîş ez. Ezê xwedxwahiyê û dîzî û dujminiyê û zordariyê. Yan ezê harikarîyê û vîyanê û wekhevî û rastiyê?

Eger em li nik xwe danîn ku vîyan ya di felsefa (ez) da hey, ew (eza) ku watê(36) berjewen datiyê didet.

Wekî (ez) yê ku li dergehî didet hate di jorve bêy agehdariya xudanê malê, divêt xudanê malê yê çekdarbît bi hêz û zanînê daku bişêt hindek dirba daweşînit serê wî.

Pêdiviye xudanê malê yê wesa bît, yanî yê bihêz û hizir bît daku malxweyekê malê yê dirust bît.

Erê gelê bira çima gelê me kefte di nav van hemî giriftariya da...? Ji ber ku hindek serok û serekêt kurda hîbone, yan jî hewil diden bitinê hindek dirusmêt şorişgêrî bixwe. Ji ber biken bêy ku tiştekî ji wan diruşman sehbiken.

Xelkê milletî dikarît fêrî xebata politîkî û ya rêkxistinî bibît bêy ku serkêşêt xebatê wî xelkî fêrbiken. Lê serkêş û pisporêt şorişê nikarin di wesa bin, eger di hemî alên pirsa xwe negehin û ne hebînin.

Hindek serok nikarin taktîkek politîkî baş û karekê rekxistî danin bo demekê dirêj. Eger di pêçêboyî û desthelnebin, nexasme eger rwîdan zwî zwî birêve bi çin û zwî bihêne gorîn.

Ew rengê seroka haziriya wan conîne (tuneye) bohemî kawdana. Rwîdaneka bikenî, lê pirr mixabin! Rwîda li ewrupa, li de mê kombuna berfireh ya tayêt rêkxistineka qutabiyêt kurd hatiye girêdan li berlîna roj ava li oktobera sala 1977 ê. Sekretêrê wê rêkxirawê raporta xwe ya politîkî xwand ya ku çendîn laper bûn. Behra pîtir jiwan lapera bitinê behsê şorîşa oktobera Sovyetî bûn. Çakî û destvehênanên wê. Û zor zor bi kurtî behsê gelê kurd û xebata wî û kul û kuvan û êş û janêt wî kir. Her wesa gelek bi kurtî li ser êş û karêt rêkxirawa xwe peyîvî. Pişka dî ji raporta xwe terxankir bo hêrişan li ser împîryalîzmê û sosyalîzma cîhanî (Sosyal dîmokrat) û markisiyêt ne şopa Sovyetîda di çin û dihîzirin.

Di wî demîde Xudê jê razî (Norî Şaweyş) yê li wêrê bu îna got: Bawer biken min bi guhêt xwe ye gul raporta komîta serekî ya parta komonista Sovyêtî boy. Lê ev hemî dirêjî û hwîriye têde nebû.

Herwesa got: Sovyetî nevêt guh bidete hewe, bivî loqey lawazî û belav bûna hewe xuya diket. Pediviye hwîn xwe bînine pêş bikarê xwe, bi tinê bese hwîn car car bahsê şorişa oktoberê biken. Çonkî pêşkeftinxwazî, ew nîne mirov rastiya xwe li bin hindek perdêt sor bivêşêrêt, îna hemî kenîn.

Hosanê hindek rowşenbîrênme di şorişgeratiyê digehiş-

tin. Bi gotinê hêzek mezin, dirastiya karîda wek peqîşkekê li ser sîpelên harên derya berjewendiyên cîhanî.

Çi nakokî(37) dinav şorişa Îlonê de 1961-1975z hebûn li Kurdistana jêrî.

Yekemîn nakokî li sala 1959 ê bû wekî Hemze Ebdulla û çiwar endamêt dî ji Komîta Serekî û mekteba siyasî hatîne derkirin. Ji nav parta dîmukratî Kurdistanê di kongira çarê da.

Di kongira pêncêda li sala 1960 ê hindek nakokî li navbera nemir Mistefa Barzanî û hindek endamêt mekteba siyasî hatine pêş. Barzanî ji kongirê xwast ku bihête efo kirin Ji serokatîya partê, lê kongirê destorî neda. Îna mekteba siyasî konferansek li (Mawet) girêda bêy beşdarbûna Barzanî. Di wê konferansê de biryar hate dan ku hemî deselatêt Barzanî jê bihêne wergirtin. Di ser hindêre ku ev renge biryare yan jê wergirtina deselatiya ji sorokê partê bi tinê kongire dişêt derbiket. Evce nakokî kwîrtir û kwîrtir bûn lewma Barzanî girêdana kongira şeşê xwast.Li tîrmeha 1964 kongira şeşê jî lidwîf daxwaza Barzanî hate girêdan le behra pêtir ji endamêt komîta serekî hazir nebûn. Kongirê biryarda 14 endamêt komîta serekî bihêne derkirin.Neçar şerê bira kujiyê berpabû li navbera hêzêt Barzanî û hêzêt mekteba siyasî ya ku xwedaye bin perê Îranê.

Û li 28/1/1966 ê hêzêt mekteba siyasî ji Îranê vegeryan û çone dikoşa hêzêt supayê Îraqêda. Û ta nuhe jî xwîn ya ji şorişa kurdî dirijît ji egera van nakokî û netebayan. Nexasme van Kawdana rengekê bê hêvyatiyê peyda kir. Êk car dinav rêzêt rewşenbîranda. Û vê çendê dirbekê mezin daweşande hizr û bîrêt rekxistinê.

<<Partî>> di wî demîde ya pirt pirt bû di rêk xistinêt xweda, nedikarî serkêşeka rind bo kar û barêt şorişgêratî

biket. Nesaxiyêt politîkî di mişe bûn dinav rêzêt şorişê de. Wekî paşve nebirina xirabkaran, yan bê pwîteyî(38), nebûna serkêşiya bihev û kom. Peyda bûna bîrokratiyeka kojek. Ji lewma karesata 1975 ê bi ser milletîde hat. Hindek jivan rengêt nesaxiya ta nuhejî yê leş û giyanê bizava azadîxwaza kurdî dixun, li Kurdistana gorî û jêrî û herwesa li Kurdistana rojhelat û rojava. ta nuhejî hindek serok û serkêş naxwazin delîvey bidene partên politîkî yên kurdî ku cihê xwe dinav leşê şoreşê da biken.

Li sala 1973 li (instituta) kadiran ya ser bi şorişa kurdî. Şagirdekî pirsyar ji min kir. hîngê min dersa ferhenga politîkî dida. Pirsyar ji min kir û goti eve gelek rengêt boçonê yêt otonomî me xwandin, her seydayek bi rengekî otonomî ji mera şirove dikit. Lê em nizanîn kî yê dirust tire, yan kî jiwan rengêt otonomî divêt li def me yê bi beha tir bît? Helbet mekteba siyasî ew hemî reng û boçonêt otonomî pesend kiribûn. Lewma şagird sergerdan bibûn derbarey hebandina otonomî. Eve nîşana ne êkbûna hizr û bîraye di nav rêzêt partî û şoreşê da.

Herwesa nîşana ne êkbûna rêkxistinê û nabûna hestên erkdar(39) û alaziya stiratîciye. Nimunek dî ji nav şorişa kurdî li Kurdistana jêrî, ew şoreşa xelkê me li hemî parçêt Kurdistanê çavêt wan lêbûn û hîviyêt mezin li ser girêdidan. Topxana şoreşê binkekê supayê Îraqê li serê çiyayê zozik top baran kir. Paşan ferman da pêşmergey da ku hêrişê biken ser binkê top baran kirî. Lê serpelê wan pêşmerga wenekir hêriş bihête kirin û guh neda fermana yê ji xwe pêheltir, gotî: Eger pêşmerge hêrîşê biken hemî dê şehîd kevin û dê qut bir bin(40).

Piştî hingê birojekê peyam bo şoreşê hat û diyar kir ku wê top baranê hêzêt dujminî li wî cihî qutbir kiribûn û hemî kuştibûn. Lê hêzeka supayî ji balek ço rûnişte cihê

wan. Cihê daxê ewe kesê çu negote wî berpirsê wan pêşmerga yêku nehêlay hêriş bihête kirin. Eve nîşana bîrukratiyê û durwîyatiya politîkî bû ya ku boye derdek mezin dinav rêzêt şorişê da.

Mirov wekî xeletîyê diket divêt buhayê xeletiya xwe bidet. Lê gelek caran yê xeletiyek kiriba di hate xelat kirin, yan hindek pare dikirine berwîkê da ku bimînit û ji xeletiya xwe nerevît û qesta dujmînî neket û nekevîte di koşa wîda. Birastî her ev renge reftare di gel wan kesa hate bikar hînan. ewên rijêma Îraqê paldayn daku leşê paqijê Barzanî yê nemir bînine der.

Ew karê kirêt û neterz yê ku boye egera hindê pêşmerge tivengêt xwe ji dujmina wergêrin û dirêj kene singêt hev, li bin sîbera pîlanêt aşkira yêt dujminan û xwîneka gerim û mişe divê barêda hate rêtin.

Êketiya qutabiyêt Kurdistana Îraqê li dest pêka salên heftîyan, bikarê rewşen birkirina xelkî rabûn, li herêma şengalê, ew herêma ku rijêma Îraqê di xwast û hewil dida ku şexsiyeta me ya neteweyî ramalît û nehêlîte li wêrê. Helbet min bixwejî şanaziya beşdarbûnê di wî karê rewşenbîrkirinê da hebû. Min pirsyar ji gelek cotyarêt êzdî dikir, ka çima dinav rêzêt şorişa kurdî da beşdariyê diken û bi kar û barêt şoreşê radibin?

Bersiva wan eve bû: Em jî kurdîn û pêşmergeyne me ew tişt divêt yê serok û rêberê me Barzanî divêt. Helbet evejî wêne nedîtin û bê armanciyê ye li def gelek xelkê me li Kurdistana jêrî yêt ku geleka digotin ew rewşenbîr tir û bihizirtirin.

serkirdayetiya Katî(41) beşdarî di kongira nehê ya parta dîmukrata Kurdistana Îraqê da kir ya ku li sala 1979 hatiye girêdan. Dirêjî da beşdariya xwe her ji destpêka kongirê taku dumahiyê... hindek endamêt serkirdayetiya

katî dilê wan neçoyê xwe bihelbijêrin, her wesa gotî me nevêt di nav rêzêt partîde êdî kar bikeyn. Behra pitir ji endamêt serkirdayetiya katî hindek xal danane berçavêt kongirê û daxwaz kir ku kongire wan xalan pesend biket. Ew xal wekî mercekî havêtine ber kongirey. Ji wan xala: Serkirdayetî, serkirdayetiyeka civakî bît, û partî li pey sosyalîzma zanistî birêve biçît û xebata xwe biket. Mekteba siyasî berpirsyara aborîyê bît. Xebatkar Mesûd Barzanî serokê partê bît. herwesa mercêt dî jî, sebaret rêkxistina hêzêt supayê şoreşê û harîkarî digel partên karker û komonist hebît û otonomî bi pirsa dîmukrasîyêve bihête girêdan. Û li dumahiyê pêşniyarek wek daxwazek û mercek îna pêş, ew jî: Çarde endam ji endamêt kevnêt serkirdayetiya katî bikene di komîta serekiya partî da.

Kongirê hindek xal ji wan xalan pesend kirin, lê hindek jî ne û hemcar karê jêk cudabûnê û du serekiyê û hevrikiyê ranewestiya.

Ev rastiya here tal û nexweş li Kurdistana rojhelat jî dihête berçav. Wekî parta dîmukrata Kurdistana Iran bûye du parçe û peyrewê kongira çarê hatiye damezrandin û boye harîkarê Xomeynî û dijî parta dayîk rawestiyay. Û parta dayîk jî boye harîkara rijêma Seddam Husênî.

Herwesa kawdanêt Kurdistana jorî jî di baştir nebûn ji van parçêt dî yêt Kurdistanê... nexasime wekî parta dîmukrata Kurdistan-Turkiya boye hela meteкê hestîka û cuda hî keftiye di nav rêzêt (KUK) da. Ji bilî dujminkariya mezin di navbera hindek partêt Kurdistanê da.

Kurdistana rojava jî jivan kul û derda ne ya xaliye. Cudahiyêt kujek dinav bera parta kurdî ya çep rew û parta dîmukrata kurdî di mişene... û hosanê Şivan ji serêt pezî pitir lê di hên. Pezêt jar jî her dimînin liber leqêt gurgan.

Nivêsînêt rêkxistinêt Kurdistanê hîzrêt burcuwazî û

Markîsizîmî-Lînînizmî derdibirin. Li di nav hindeka ji wan nîvêsîna da dê bînî heyamêt neteweyî û heyamêt nîştimanî jêk nahêne vavartin.

Û stiratîjiya (mafê çare nivîs) di gel (otonomî) têkel diken. Heval bendiya jî di gel wan layêt Kurdistan dagîr kirî girê di den! Herwesa zengîn bonî û şexisperistî û şepeşer(42) û partek mayê xwe di şolê parta dîda biket, di mişene, û di berçavin.

Ji bilî hindê ku pwîte bi girêdana kongireka stiratîjî nahête dan. Ji bo danana politîka Parastina neteweyî ya Kurdistanê. Lewma hesêt şoreşgêrêt cîhanî jî dil bi me na sojît.

Ta nuhejî hindek hêzêt Kurdistanê bi drustî di bizava azadîxweziya cîhanî nagehin. Ji ber têkelkirina hindek ne drustiyêt partêt komonist li Turkiya û Iran ê û Soriyê û Îraqê, di gel bîzava pêşkeftin xwaza cîhanî û pêcênebûna jêkvavartinê li nav bera derbirînêt politîkî? Yekêtiya Sovyet wek hêzek cîhanî mezin, ke harîkarek bo bizava azadîxwaza kurdî... û hindek cara bo hindek rijêmêt kevne perist ji bo parastina berjewendiyêt xwe, wek dewletek mezin û bi hêz. Di wî demîda dest ji hindek bizavêt azadî xwaz berdidet, û pişta xwe didetê, nexasme eger leşê wan bizava tijî nesaxî û netebayî bin.

Dikarîn bêjîn serkêşêt pirsa kurdî çu cara neşyane xwe li ser rwîdana feriz biken, daku dewletêt mezin pwîteyekê baş û drust bidene pirsa kurdî.

Wekî xelkî bawerî biserkêşekî nema, yan ruyêt nîştimanperwerî yêt partekê kirêt bûn gelek sexte careka dî ew bawerî bizivrîte ve, yan ew rwî ciwan bibne ve.

Ew karêt pîs û herimî ewêt hatîne kirin li Kurdistana Îraqê û Îranê... helkendina (vekolana) gorê Barzaniyê nemir ji aliyê hindek kesa ve, û virêkirina hindek pelêt pê-

şmerga bo nav daristanêt bane û serdestê daku ji hindek pêşmergêt dî bihêne adekirin nîşana kirêtiya taktîka hemberî stiratîjîyê ye di peywendiyêt derve da.

Vê bira kujiyê rêzêt kurda yêkbelavkirin û baweriya xelkî xav kir, û derfetê sûdwergirtinê ji cengê Îraq ê û Îranê ji dest da.

Herkesekê xelkî rûyek dayê dê sîngê xwe kêlket û bêjît. Ezim serekê kurda! Û her kesekê di kursîkekê da rûnişte xwarê di nav rêzêt bizava kurdî da, dîsa dê sîngê xwe kêl ket û dê bêjît:

Ezim kurê şoreşê yê rast û drust! Ezîm min şoreş helkirî !! Û xelkê me yê jar û reben jî gorî van renge reftara bu. Ev reftarêt dikarîn bêjin: Bazirganiye bi şoreşê û xwîn û xuha xelkê xebatkar.

Pêdiviye netebayêt giring û bi seng bihêne vavartin ji netebayêt biçwîk û sivik. ew vavartin pêdiviye riyalîstî bît, daku careka dî xeletî berpa nebine ve... ev xeletîyêt boyne egera gelek karesata di dîroka xebata gelê mede. Çonkî eger me tiraziyeka rind û zanistî nebît bo hemî kêşan û pîvana , dîsa dê kevîn nav gêleşoka xeletiyêt çînayetî û xwedxwaliyê.

Kurdistan bi şêweyekê giştî ya dagîrkirye û parçe parçe kiriye, Cudahî nakevîte navbera du kurdêt riyalîstbîn li ser vê rastiya berçav û aşkira.

Parçe bûna Kurdistanê ji egera berjewendiyêt derebegî bû liser demê şerê (Çaldîran) li sala 1514 ê ta peymana Erzerûm li sala 1639 ê. Herweha ji egera pîlanêt Kapîtalîzmî-Împiryalîzmî bû ji peymana (Saykspîko) taku (San Rîmo) û Kongira aştbûnê û peymana Lozan û Seid Abad û sento û dumahîka êmnahîya tuxwîba li navbera Îraqê û Îranê û Turkiyê û Soriyê.

Lê dagîrkirina Kurdistanê encamê dagîrkirina bi zoriye,

bi hêz û çek û supayê wan dewletên Kurdistan dinav xweda dabeşkirî û azadiya gelê Kurd nehêlay û mafê çare nivîs jê wergirtî û bêhin lê teng û çik kirî.

Kurdistan ya hatiye girêdan bi bazarê sermayedarîve û bi berjewendiyêt stiratîjî yêt dewletêt mezin ve.

Împiryalîzm û Kapîtalîzm û herwesa kevneperistên kurdan palpistên dagîrkirina Kurdistanêne.

Lê netebayên ku di nav rêzêt bizava azadî xwaza neteweyî ya kurd da peyda dibin ne zor di kwîr û mazinin. Dibê bihêne çareserkirin bilogên dîmukrasî û birayînî û hestên erkdar. Tiştek diyare ku çareserîya netebaya serekî nahête kirin eger ne bi rêya xebateka politîkî ya rind û bi cengî nebît. Herwesa bi zanînê û tegehiştînê û stratîjîyeka ruhn û zelal.

Û kengî netebaya serekî çareserbu hîngê pêdivîye pwîte bi netebayên dî bihêne kirin. Nek netebayên serekî bihêline lipaş û bi netebayên navxweda mijwîl bibîn. Di heyamê (qonax) rizgarbûna neteweyî da.

Û pêdivîye biçavekê giring mêzdeyne peywendiyên Kurdayetiyê û pişta xwe bi hêza xwe bi xwe gerim ken nexasme çînêt hejar û tepe ser.Ji cotkara û karker û rêncber û rewşenbîrên şoreşgêr.

Hindek partêt Kurdistanê neşiyane armancêt xwe di rêya rizgarbûnêda diyar(43) biken. Û nikarîne şoreşê binasin û hevbendêt xwe destnîşan biken ne li derve û ne jî linavda.

Destnîşan kirina hevbenda wekî hêskê di politîka bizava azadî xwaza kurdîda dihat û di ço, carna di kampa sosyalizma cîhanî û bizavêt azadî xwaz bi hevbendêt xwe diniyasîn û dinasin, carna jî şahî û xumênî û Emrîka.

# Cîhankirina pirsa kurdî û peywendiyêt Kurdistanê di gel derve

Aya pirsa kurdî bi tinê pirsek nav xweyiye, yan pirsek cîhaniye û peywendiyêt xwe bi swîstema cîhanîve hene? Su(44) têde nîne ku pirsa kurdî pirsek nav xweyî nîne, belkî pirseka cîhanî ya mezine. Peywendî û tuxwîbêt xwe yên cugrafî yên berfîreh yên heyn digel cîhanê.

Cîhankirina pirsa kurdî û herwesa bizava azadîxwaza kurdî dibît pitir bînîte pêş wek başiyek di(Rîmland) da, wekî pirofîsor (bavîç) di kitêba xweda (Kurdistan û pirsa kurdî) dibêjît, ji ber cihê Kurdistanê yê politîkî.

Têkdana mafê çare nivîsa gelan pirsek cîhaniye li dwîf (li gor) peyman nama dewletên yekgirtî. Û ev çende êkê (yeke) ji deselatêt dewletêt êkgirtî. Û mafê çarenivîs nebitenê yê hemî gelane, ewêt ku di bît bikevne bin darê zorê û dagîrkirinê.

Û ev gelne serê xwe bo biyaniya na çemînin,belkî dê berdewam berxwedana berpa ken sexmeratî rizgarbûna xwe ta bişên (bikarin) bibin xweyîyên politîk û komel û aboriya xwe.

Herwesa bo nimone em dikarîn tibla xwe dirêj keyne xala (55) di peyman nama dewletên (netewên) yekgirtî da, ku têda ya hatiye nivêsîn. Hemî gela mafê çarenivîsa xwe yê hey û pêdiviye rêz li hemberiyê (45) wekheviyê bihête girtin.

Belê pa hindek rêkxistinên kurdî otonomî ji bo xwe dikine diruşm û armanc da ku pirsa kurdî ji nav çarçova wê ya cîhanî derbînin û bikin pirsek navxweyî, û yariyek dinav destên diktatorên ku nevên gelê Kurd wek milletek serferaz bijît. Harîkarî li navbera hemî parçên Kurdistanê

giringtirin erkê nukeye û pêdiviye (46) komgaheka dimukrasî neteweyî ji hemî part û rêkxirawêt Kurdistanê. Daku stiratîjiya kurdî ji wergirtina mafê çarenivîs danît ji bo daku gelê Kurd jî wekî hemî gelên cîhanê destê xwe, û hebûna xwe di hemî kar û barên cîhanêda hebît, ji bilî ku xweyîyê aborî û politîk û erdê xwe bit.

Gelê Kurd mezintirîn gele yê bêbeş û parçe parçe di cihanêda. Lê eger bizava azadîxwaza neteweyî ya kurdî bi drustî yek bigrît dê şêt rolekê (47) mezin di ser kêşiya bizava azadiya gelanda bibînit. Bivê çendê gelê Kurd dê bi erkêt xwe rabit beramber xwe û beramber gelên dî yên bindest di vê cihanêda, ev cihana dwîr ji aştiyê û rastiyê.

Îraq, Turkiya, Soriya û Îran piştî cengê cîhanî yê yekê çone dinav netewên yekgirtîda û bûne endamên wê komgahê. Hemî dewleta ew niyasîn bi tuxwîbên cugrafî yên nuhe ve. Lê ev tuxwîbe nehatîne danandin bi şêwekê dîmukrasî daku gelê Kurd jî bişêt politîka xwe li gor hezkirina xwe danit.

Lê herçî kirî û nekirî hemî bo biyanîya ço, bo wan dewletên Kurdistanê liser hatiye dabeşkirin. Kevneperestên Turk û Fars û Ereb, kerb û kwin ji gelê Kurd helgirtin û rijêmên xwe paldidane şer û cenga digel Kurda, daku wan tuxwîbên jehrawî biparêzin li bin navê parastina niştimanê xwe ji cudabûnê.

Rijêmêt kevne perist gelek sûd bo xwe ji birayîniya musilmanetiyê û hevniştimaniyê werdigirt, ta weku, Kurda pê pwîç biken û şexsiyeta wan ya neteweyî biguhorin.

Lê kurda bi dilekê sax ew birayînî dikir çunkî nedizanî divêt birayîniya birastî bihête kêşan û pîvan bi teraziya wekhevîyê.

Encamê wê birayîyê jî ew bû Kurd û Kurdistan pêkve hatine parçe parçe kirin û dabeş kirin.

Çima bizava kurdî pîtir ji carekê toşî karesata bû?

Pirt pirt bûna bizava kurdî di nav xweda, li şona xwe pişt gerim biken bi hêz û şiyanêt xwe. Nexasme şiyanêt çînên rêncber û zahmetkêş.

Çavdêriya harîkariyêt derve û biyaniya. Çav poşan ji guhorînêt di kevne dinav politîka aboriya cîhanîda, bi taybetî piştî turkiya çoye di nav hevbendiya Nato'da . Û bi nu bûna peymana Emro- Turkî li salên heştêyanda. Û Îran bûye bingehekê sihosyatiya[48] Emrîkî li serdemê Şahî.

Herwesa bizava kurdî giringiya pêdivî neda peymana Îraqî- Sovyetî yaku hatiye bestin li sala 1972. Û ew giringî neda bi beha bûna petrolê li sala 1973. yan heval bendiya Îraqê di gel şoreşa gelên Îranê. Ew şorişa li dumahiya qonaxa xwe ji dîmukrasîyê va rê [49] boy. Herwesa bizava kurdî raya giştî ya cîhanî bi pişt guhên xwe ve havêt.

Disan divêt paşvemana komelayetî û aborî û rewşenbîrî ya gelê Kurd jî bîr nekeyn. Û lawaziya wan rekxistinên serkêşiya bizava kurdî dikir.

Ji aliyekê divê dujminkariya împiyalîzm û kapitalîzm û kevneperestên Kurd û rijêmên Kurdistan dagîr kirî. Herdem hewl dida bizava kurdî bişkênin û ji ber êk bibin.

Sovyet wek dewletek mezin di cîhanêda berjewendiyên xwe yên taybetî di herêma rojhelata navînda diparastin. Nexasme berjewendiyên wê divê deverêda gelek di giring û stiratîjî bûn. Lema politîkeka rind beramber bizav û pirsa kurdî bikar ne anîn.

Îranê, Turkiya, Îraqê û Soryê hemya pêkve dijatiya livîna kurda dikir li dwîf pileyên yek cuda.

Bizava kurdî dibû astengek dirêya pîlanên parastina berjewendiyên Emerîkî divê herêmê da. Ji ber hindê hêdî hedî xwe nêzîkî şoreşa kurdî dikir bi rêya Îranê û bidilxweşiya şahî, lî şiya peywendiya di gel girêdet. Lê di gel

hindê şoreşa kurdî peywendiyên xwe yên teng di gel Sovyêtê nebirîn.

Îrana Şahî viya hindek peywendiya di gel şoreşa Kurdî li Kurdistana Îraqê bêy Barzanî girêdet. Ev daxwaze gehande mekteba siyasî û şiya hindek peywendiya di gel ra çînit li nîva sala 1962 ê ew peywendî mezin bûn taku bwîne egera dula bûna partî û şoreşê û piştî hîngê jî ew peywendî her man di gel serkirdayetiya şoreşa Berzanî ta karesata 1975 ê.

Harîkariya Îrana Şahî mebest pê kuştina şoreşê bû û peyda kirina hevrikiyê û jêk cuda bûnê di gel gelê me yê Kurd li Kurdistana roj helat. Û ew hev rikî û jêk cudabûn kwîr tir û mezintir bûn li ser demê Xomeynî.

Topxana Îranê we li peşmergey kir wekî supaye kî şerî biket îna sivikiya pêşmerga di şera da kuşt. Nexasme Îraniya topxana xwe bi dest pêşmergey ve bernedida û wesa bikar dianî her wekî wan diviya, ne herwekî şoriş pêdivî.

Ew topxane bi drustî topxana dujminên şorişê û gelî bû. Ev rengê şerê sîstem yan (50) şerê bi şêwê supay li ser demê Xumeynî jî her hebû. Rwîdan wesa pêşveçûn taku serên çiyayên devera Hacî Omeran hatiye dagirkirin ji aliyê supayê Îranê ve, piştî ku hatiye rizgarkirin bi xwîna leşkerê şorişgerê Kurdistanê û nêzîkî 60 şehîda jê ketin. Behayê xwîna wan şehîda ew bû; dijminekê dî serên wan çiya dagîrkirin.

Rojnama Enwar ya Bêrûtî li roja 2 y Îlonê li sala 1975 axiftineka Şahî di hevpeyvnekêda di gel Muhemed Hesenên Heykel belavkir têda got bû, <<Belê me harîkariya şoreşa kurdî kir li vê dumahiyê em bûyn hêza xort li pişta wê, wekî me xwe jê vekêşay; ew qewmî ya qewî..

Lê min dît rastiyeke ya hey, gelek salan rijêmên Îraqê

kwîn ji me heldigiritin, piropagendêt, kirêt, dijminkariyeka aşkira.. Xirabkar velîsandî (bidizî) ji tuxwîban derbaz dibûn hindek cara şer di qewmîn... Îna min dît, şorişa kurdî delîvek baş. Min di dilê xweda gotî çima ez bo xwe bikar naînim, û min wekir, boçî ne? Ma min divêt kêşeka (51) kurdî berpa bikem? Helbet ne... Bîra te bihêt min jî livêrê (Îranê) hindikîyeka mezin ya kurda ya hey>>

Ev rastiye dikevîte ser Îrana Xumeynî jî û dibit birengekê kovandartin. Wekî pasdarên Îranê diketine pêşiya pêşmerga li nav rêzêt şorişê, li nav axa Kurdistana jêrî. Û serbazê Îraqêdikete pêşiya pêşmerga li nav rêzêt şoreşa kurdî û Kurdistana rojhelat. Serkêşêt kurda bîra xwe neîna ku gelê Kurd yê dibin darê zordariyê ve li herdu la, li herdu parçên Kurdistanê, li parça rojhelat û liparça jêrî.

Aya Xumênî yan Seddamî, yan Êvrîn, divêt kêşa kurdî bimeyzînin û berpa bikin.

Eger Xumeynî rizgarbûna gelê Kurd divêt, çima baweriyê biwê rizgarbûnê naînêt li Kurdistana rojhelat?

Herweha ev rastiye di qepitîte ser dêmagogîya Seddamî, harîkariya Kurdêt Îranê diket. Bombayên jehra şîmyayî di havête ser serê Kurdên Îraqê.

Hemî rastî û hemî serbor, wesa diyardikin ku, bizava azadîxwaza kurdî, ya rêkxistîtir û bihêztir bû li salên 1977 - 1979 ê wekî serxwebûna xwe û sexletên xwe yên kurdayetî diparastin. Û piştî hingê ew bizav ji rêya xwe varê bû, wekî berî hîngê jê varê boy.

Derbarey harîkariyên Emrîkî bo şorişa kurdî berî karesata 1975 ê ji zar lîjna <<Bayk>> Muhemed Hesenên Heykel di kitêba xweda (Elhel we Elherb), di berperê 140 ê da dibêjit <<politîka me derbarey kurdan bê rûmet bû, ne me harîkariya wan kir û ne me hêla kêşêt xwe di gel dewleta Îraqê bi hevpeyvînê çare ser bikin.. Me azirandin paşan me

xwe jê kêşa>>.

Nivêsîneka dî ya destgahê simusyatîyê yê Emrîkî CIA li 24 ê Adara 1974 ê dibêjît: <<Ne Îrana Şahî hevbenda meye û ne me divêt pirsa kurdî çare ser bibît birêkekê yan bi êka dî>>.

Wefdekê kurdî, karmendek [52] ji mendobêt Emrîkî li koma milletên yekgirtî dît, her wekî di raporta ramyarî ya ( P.D. K) da hatî ewa li konferansa sala 1976 ê da hatiye pêşkêşkirin wî karmendê Emrîkî got: <<Politîka me naxwazît Bàsiya biroxînit, lê di xwazît politîka wan pê bidit guhrîn. Eger hat û politîka xwe guhorî (Bàsiya); hîngê dê jê xwazîn da hindek kêmatiya (tenazulat) bo bzava kurdî bikin >>.

Politîka Sovyetî jî, herwesa naxwazît di van kawdana da Bàsiya biroxînit. Sovêtî pitir ji hemiya harîkariya makîna cengê Îraqê dikin li van salên diwayîda.

Yekêtiya Sovyet xwe havêt di nav kêşa kurdî da li sala 1963 ê wekî ge fa [53] xwe ya bi nav û deng daye Turkî û Îraqê û Îranê û gotî: Divêt hwîn şerê xwe ji ser kurdan helînin. Lê piştî berjewendiyên Sovêtî li herema rojhelata naverast berfireh boyn, êdî pwîte bi kurda nekir, mişkanê [54] li ser Ereba kir, piştî Cemal Ebdulnasirî dergehên cihana erebî bo vekirin. Şerenîxeka mezin linavbera Sovêtî û Emrîka hebû li ser rojhelata navîn. Politîka herdu dewletan li ser vê çendê dihate neqşandin; ji bo parastina berjewendîyên xwe yên stiratatîcî.

Politîka Sovyetî beramber kurda, wekî hemî politîka wê bû li devera rojhelata navîn. Bizava azadîxwaza kurdî bikar anî ji bo fişarekê (zextekê) bêxîte ser wan rijêmên Kurdistan dagîr kirî, yan da ku destê Emrîkanî kurt bibît divê herêmêda. Ev renge politîke dibit ya sud bexiş bît, ji bo mukimkirna cihê piyê xwe li rojhelata navîn.

Herwesa damezrandina binyatekê serbixwe bo Kurdan xweş lidilê Emrîka U yê dewletên rojava nahêt naxasme di van kawdana da, û ne li dilê Sovyetî dihêt. Ji ber hindê fere li ser xelkê Kurdistanê xwe rêk bêxît û stiratîjîyeka rind ya politîkî û supayî ji xwere bineqşînit; û guhorîn û wergeryana tevnê dinavkira çoyî yê hêzêt cîhanî li deverê û hemî cîhanê danîne ber çavên xwe. Çunkî têgehiştina gelê Kurd û êk girtina wî dibît hindek tevnên (hawkêşe) nwî peyda biket.

Ev rastiya ne bitinê dikevîte berûka mezinên kurda, lê her kurdekî, nexasme rewşenbîr û zana pêdiviye van hemî tevnên ramyarî bixwînin û hizrên xwe têda biken. Û bizanin çi kar yan çi peywendî di gel kawdanên Kurdistanê û pirsa kurdî ve heye.

Bizava azadîxwaza kurdî li Kurdistana Îraqê hindek mere danane ser partên Kurdistanê li parçên dî yên Kurdistan, da peywendî li ser wî bingehî bin û taku nuhejî ew bizav birêkxistinên xwe yên corawcor (55) ve yên ku hindek cara di hev digehin û hindek carên di şerenîxê di gel hev diken, dinav çarçova berê Kurdistanê da, Nuhejî hindek mercan dimezêxin (ferizdikin) ji bo bestina hindek hevbendiyên dutayî jî bo mukim kirina cihên xwe bitinê û lawazkirina rêkxistinên dî. Lê dîsa em li wê bawerêyne ku berê Kurdistanî yê ku hatiye damezrandin li Gulana 1988 pêngavek baş û mezine ji bo pêşve çonê.

Hindek partên komonistên Erebî û rojhelata navîn di kongirên xweda û di hindek piropagendên xweda dibêjin.! Dibê gelê Kurd xweyiyê çarenivîsa xwe bît. Paşan hindek jiwan rêkxistina dê wan biryar û piropagenda vala kin ji bêhnê û naverokê bihelgirtina diruşmê otonomî. Katî û rêkê jî ew diyar diken li ser binyatê stiratîjiyên xwe bo çona di Kursîka mîraniyêda (serdariyê) li her dewletekê,

pirsa kurdî li nik wan negiringe. Otonomî bi hizra wan parta ewe çareseriyeka bi dev (teyorî) ya aştiyane û dîmukrasî û birayînî.

Xudanên şewqên şîn û hindek xudanên kirasên sûr li duryan vêkdikevin li ser dijatiya cudabûnê. Lê nabit cudabûn bo pirsa kurdî bihête gotin. Çunkî Kurdistan ya dagirkiriye û tiştê milletê Kurd divêt, rizgarkirina welatê xweye, û xwebûna mafê çare nivîsa xweye. Evce jîneka aştîyane digel hemî gelan li ser bingehên birayînî û wekhevî û mirovayetiyê.

Ew kesên baweriyê bi vê rastiyê neînin şwîna qoçanê di gel rastiyê biken bila bidiruşmû politîka rengawrenga xweve biçin deryayên kwîr daku xwe ji gunnehan bişon.

Yan azadî yan bendegî. Yan serxwebûn yan jî dagîrkirin. Yan serbestî yan jî jêr destî. Yan hemberî û wekhevî, yan jî kedxwarin û mêyin. Yan rastî yan jî pîsî. Çu nîv nîve yan jî navincî nakevne dinavbera van hemî tiştada. Yê ji dîroka mirovayetiyê divê çendê negehit << ew bê fehme (Xebî) wî cu çare nînin wekî lênîn dibêjît.

# Stiratîjiyet û pêdiviyatên nuhe

Di şirovekirnekê da bo warê ramyarî û aborî û komelayetî yê ku gelê Kurd têda dijît, mirov nikarit çarçova dirust ya bo rwîdanên dîrokî yêt pirsa kurdî bibînit û eger mirov diborî û paşiyên wê negehit û ew egerêt boyne palder û pêşvebirî. Kurd wek netewek, wek gelek, wek milletek parçe parçe kirî, hate çewsandin ji aliyê împiratoriyên rojhelat ve û bi taybetî ji aliyê împiratoriyeta Osmanî ve ji bîlî ku Kurdistan toşî hêrişên mezin boy ewên bi ser rojhelata navînda hatin. Herwesa kolonyalîzmên Îngilîz û Frensî û Rusya qeyserî ta dumahiyê împiryalizma cîhanî û rijêmên kevneperestên Kurdistan dagirkirî û kevneperestên Kurd.

Ew parta serkêşiya bizava azadîxwaza kurdî dikit divê tê bigehit, ku ew bizave, bizavek şorişgêr û nîştiman perwer û dîmukratiye, dijî kevneperestiyê û dagîrkirinê û mêtina aboriye. Parta şoroşgêr divêt baweriyê bi çareserkirinên pelose neînit. Çunkî komelgaha kurdî pêdivî hindek guhorînaye ku ji rih û rîşallan bihênekirin di warê aborî, komelayetî, rewşenbîrî û ramyarîda ji sûda çînên tepeser.

Hindek parta aydyolojiyeka ruhn û zelal nîne ji lewme kadir û pisporên wan li dwif dilê xwe tişta şilove dikin. Ji bo berjewendiyên xwe yan kirasêt çeprew yên kirine berxwe û hindek gotinên bo xwe ji ber kirîn bêy ku di ya sayên giştî yên vê tiyorê (Sosyalizma zanistî) bigehin, yan bizanin kanê dê çawan bikêr komelga gelê Kurd hên li pey kawdanên wê yên navxweyî û yên derve.

Hindek dî demê guh li nav tiyora şorişgêr dibît; muyên wan dibine zixt û navçavên wan têkdiçin, dwîkêl ji difnên wan difirit bêy ku bizanin ka çawane û dibêjin: Emîn

peykêt (peyamber) dirustên warê xwe.

Lê çep ruyên tiyorî yên zarokî, ewên ji warê xwe di tirsin û rundika dibarînin jiber karesatên biser milletîda dihên ji egera berzebûna tiyorî bêy ku dinave roka warê xwe bigehin, ewan baweriya bi tiyoriya zanistî hey, lê bi nezanîn dixin ser warê xwe. Ew wekî wanin ewên li ser lingekî birêve diçin.

Bawerî înan bi tiyora zanistî ne gotinek ciwan veloviran-diye bi devî, lê kar û kiryarek şorişgêriye. Mezintirîn pêş-keftin xwazê Kurd ewe yê di pencera kurdewariyêre di tiyora zanistiyê digehît ji bo xizmeta gelê Kurd û azadiya wî ji bo rizgarkirina Kurdistanê ji bin darê dagîrkirinê.

Tiyor û zanîn dibê pêşbikevin di gel pêşkeftina gelî, bi şol û xebata niştimanperwer, dîmukrasî û şorişgêrî. Bi ça-lekiyên zeber dest, bi têgehiştinên yasayên bizavê û çare-serkirina gîriftariyên diravî yên mirovê Kurd, bi rêya mişe kirina berhemî û têgihiştinê, têgehiştin ji çunehiyê nahêt, lê bi karî dihêt û ev hemî pêşkeftin û şarewaniye berhemê şolê mirovaye.

Milletê Kurd milletek saxe, xebatkare evîndarê serbes-tiyêye. Dîrok nikarît nimûnekî bidite me hindî. Kurdan rênc û nexweşî û mişextbûn dîtbît. Li nav salên dirêj yên cane mergiyê û hizretbûnê û zordariyê. Lê di gel hindê gelê Kurd yê dirêjiyê didite xebata xwe bi şîyaneka hêja û bo hemî cîhanê diyardiket ku milletê Kurd milletek pir hêjaye û ji hejî şolî û jînêye.

Milletê hosa herdem dê yê nemir û serbilin bit. Eger hat û xwe rêkxist û serkêşiyeka jîr û zana serkêşiya wî kir bo serkeftinê.

Ev gelê bixwîna xort û lawên xwe yê şiyay ji bin her ka-resatekê derkevit bi hêzek mezintir û pir şiyantir; milletek e bi drustî bihayê xwîna canemergêt xwe dizanit û birêz-

girtinek mezin beramberî kêliyên gorên wan dirawestit. Şehîdên me di kwîratiya dilên mede dijîn û di saxin.

Rewşa nuha em têda dijîn, bi serbor û şirovekirnê dê nîşa medet : Me hêzeka mukim, bi ronahî û çekdar bi hizrên aydiyolîjiya zanistî nîne da karwanê şorişa me birêve bibit. Ev çende bû giringtirîn eger, karesat bi ser bizava azadîxwaza meda anîn.

Bizava azadîxwaza kurdî toşî yek xeletî bû wekî diruşmên şêlî dihelgirtin di dîroka karwanê xebatta xwe ya dirêj da. Diruşmên xav wek mafên rewşenbîrî, yan bê bingehî,yan otonomî. Em hemî dizanîn ku ev dirûşme çareseriya pirsa kurdî nakin û netiştekî ji bi lî karekê burcuwazî wek dirust kirina kişt û kaliyê (çandinê) yan milî (temîn) kirina petrolê.

Kêşa herî mezin ewe Kurdistan ya dagirkiriye û bi hîç rengekî xweşî ji mafên neteweyî nahête dîtin bi şêwê <<otonomî>> li bin sîbera dagîriyê.

Gelê kurd yê li ser axa niştimanê xwe Kurdistanê jiyay li hemî parçên wê, û vî gelî mafê hey bibîte xweyê çarenivîsa xwe biserbestî, çunkî mafê çarenivîs mafê hemî gelan û hemî milletane. Her milletekî mafê destnîşankirina pisbor û serkêşên xwe yê hey, daku kar û barên wî birêve bibet li ser xakê wî yê cugrafî. Çunkî ew parçekî ji rumetiya wî, bêy ku biyaniyek mayê xwe têda bikit. Evce çi ew biyanî ji kempa rojhelat bit yan jî, ji dewletên roj ava bit.

Taku nuhe hindek partên Kurdistanê yên heyn ji lawaziya xwe, xwe bo çepî yan rastî şirîn dikin, bi helnegirtina diruşmê çarenivîs. Gelê Kurd yê xebatê dikit ji bo rizgarkirina axa xwe ya dagîrkirî, ji bo zivrandina serbestiya xwe ya ku parçeke ji buhayê mirovayetiya wî, ya ne hête parçekirin.

Rastrew ji serxwebûnê di tirsin, çunkî wêraniya wan ya têda.. Çepê zaro kî û ewên peyvên şorişgerî bi xwe kirine benîşt di devê xweda ji şofeniya gelê zordar ditirsit, ku ji xwe

veder bi hêlit ji şofêniya gelê mezin ditirsit yê ku Kurdistan dagirkirî. Lewma diruşmên werzî li dwîf dilê xwe dihelgirin daku xweliyê û tozê bi havêjne ser çavan.

Dr. Wanlî rastî anî pêş di gotarê xweda <<Li ser stiratîjiya politîkî û supayî ya bi bizava niştiman perwera kurdî nîgahek[57] bo demê borî û nuhe û yek dî bo paşe rojê>> yê ku di govara nivêsînên kurdî da hatiye belav kirin jimare 2 li sala 1985 ê, dibêjît: <<Berjewendiya bilind ya gelê kurd pêdîvî xebatê ye ji bo helandina tuxwîbên bidest çêkirî, yên welat lê parçe parçe kirî bi ramyarî, û derkirina hêzên kapîtalîzma dagîrker ji Kurdistanê, û bijwînkirina (pakkirina) vî welatî ji destê împiryalîzmê û binyatên wê, û avakirna dewleta kurdî ya dîmukratî, ya ku delîva li ber xelkê xwe vedikit da bi pêş bikevin û guldar bibin. Û gelê kurd mafê xwe yê her û her yê hey, yanî her hebû û her dê mînit bêy ku xebata xwe biket ji bo azadiya niştimanî û yekbûna nîştimanî û helbijartina biratiya wan bixwe divêt û paşan vebirîn û diyarkirina peywendiyên hevtixwîbiyê û birayîniyê di gel gelên hev[58] tuxwîbê xwe>>. Di heman gotarda Dr. Wanlî li pey dîtina xwe hizra dagîr kirina Kurdistanê derbirî û got: <<Jêr destkirina hejarî bo hevtixwîbê xwe birastî kirêttirîn rengên jêrdestiyê ye, û ji hemya tund tir û bi êş tire, û ji hemiya bê dilovanî û bê miroyatî tire, û çu tuxwîb nînin bo kuştinê eger nehête ji paşve birin>>

Pêde diçit û dibêjit: <<Kirêtiya vî rengê zordariyê berî hemya kirêtiya edebî û exlaqiye. Kirêtiya exlaqî ewe, serokên gelekê hejar, gelekê dî yê hejar bêxite di tayê bindestiyê da û di nimuna gelê Kurd da mirov vê kirêtiyê du beramber dibînit, çunkî zordar û jêrzor herduk peywendiyên yek cîhanin û herduk olperistên buselmanetiyêne>>.

Hindek nivêsîn hatine terxan kirin ku naveroka

kapîtalîzmî ya kilasikî na qepitîte ser warê rewşa Kurdistanê, çunkî sîstema kapîtalizmê cudaye ji sîstema mêtingehî,(59) lê li Kurdistanê sîstem êke wekî serokaniya rijêmê. Ev renge boçûne, têgehiştinek mafî zor berteng û taybetiye, çunkî kapitalizm ya peyda boy ewe bendegî peyda boy. Têgehiştina kapîtalizmatiyê nebitinê watê sîstemêye, lê berzebûna serbestiyê û dîmukrasiyêye. Çî kapîtalîzmî bihête berçav wek sîstemek cîhanî yan ne.

Kapîtalîzm li dwîf şirovekirina <<Daîra zanînê, ya Siwêdî>> pişka 3, yanî dewletek destê xwe danite ser hindek herêmêt dî ji dervey tuxwîbêt xwe, û sergêriya wan herêma bidest xwe bigrit. Li çerxê hejdê peyva kapîtalîzm ya hatiye bikaranîn, lê kapîtalîzm birastî hebu ewe li ser demê mêtingehên fînîqî li çerxê heştê berî zayînî (B.Z) Li devera derya sipiya navincî. Û bikaranîna wan mêtingeha bo mebestên bazirganiyê.

Baweriya me ewe; Kapîtalîzm her hebû berî ji dayk bûna (Îsa) y bi sedeha sala pêş ku bibîte sîstemek cîhanî. Yanî merc nîne mêtingeh dewletek neteweyî xudan biryar bit, biryarêt xwe ji dest dabin ji egera kapîtalîzmê yan dagîr kirinê. Çunkî eger me rastî bivêt, berî ji daykbûna Îsa y çu dewletên neteweyî hebûna xwe nebû. Li roj helata navîn çu dewletên neteweyî nebûn ta piştî cengê cîhanî yê yekê. Û di ser hindêra; deverêt kevin yên dewleta Osmanî kirine metingehên Ingilîzî û Ferensî piştî Împiratoriya Osmanî heriftî. Hizra xwebûnê jî ji aliyê yasayve nebû, û peyda jî nebû hetaku (Hubiz û Montsîku û Bodan) dest pêkirî li ser peyivîn.

Di ser hindêra ku destûrên dagîrkerên Kurdistanê. Kurdistanê parçek ji nîştimanê xwe dizanin. Lê ev çende nabîte hoyekê(60) politîkî û dîrokî ku dagîrker nînin, di ser hindêra ku kapîtalîzim wek sîstemek cîhanî ya pwîç boy û

ya têkçoy.

Ferensa kapîtalîzm, Cezaîr wek beşek ji deselatdarîya xwe dizanî, li gor destûrê Ferensa. Lê Cezaîrê serxwebûna xwe bi xebata gelê xwe wergirt.

Çima hindek intihazî û mil keç ji rastrewên paşvero, û ji çeprewên zarokî vê rastiyê nabêjin û bi êş bang dikin: Kurdistan neya dagîrkiriye û ne mêtingehe! Çunkî eger ev rastiye got ya ku ser û kaniya hemî derd û êşên milletê me her eveye, hîngê dê rwîs mînin. Anku dê şelên wan kevne delingên wanda. Exlaqê wan yê komelayetî wê rê nadete wan çunkî ew neman û dumahika wane.

Kê divêt bi dînatiya xwe bi şêtatiya xwe, xwe wêran biket? Nexasme reftarên wan yên dijminkarî ew yên harkirin û bo xwe xweşiyê jê çêdikin. Evî rengê ermînê (esebî) yên welê kirîn, tirsandin û jarkirina xelkî bikarek hêja bizanin. Helbet ev rengên hanatîya politîkî û derûnî (saykolocî) nahête çareser kirin bi dermanên nûjdarîyê. (61) Lê li xwe zivirîn û li xwe gerhanê û xwevedîtinê, û di warê xwegehiştinê yê ku têda dijîn, yan bi şoreşeka jîrane da hişên wan bînîte serî. Yan jî dumahiya wan nîşa bidet. Yan welê diket hevsarê wan ji lep derkevit û rîya xwe kujiyê bigrin. Kurdistan ya dagîrkiriye, û mêtingeha (jinavdaye) bi hemî parçên xweve. Ji hemî mêtingehên dî yên derve ya cudaye, bi dîrokî, ramyarî (politîkî), aborî, komelayetî, rewşenberî û exlaqî.

Bendegî wênê êkê yê kapîtalîzmê bo, mirov yan dê yê serbest û azad bit yanjî ne. Çu tiştên dî nînin li navbera serbestiyê û ne serbestiyê, wekî Dr. Cemal Nebez di kîtêba xwede (Bîrî neteweyî Kurd) li ser di peyîvit. Eger mirov di welatê xwe yê azad da yê serbest bit, ew mirove (62) di komelgaha xweda, û xweşiyê bihemî sexletên xwe yên sirûştî dibet. Lê eger mirov li ser axa xwe ya ne azad

yê serbest nebit, ewî di komelgaha xweda sexletên xwe yên sirûştî yên winda(63) kirîn, mirovayetiya xwe disan ji wî alîve ya winda kirî û di kevîte bin dijminkariya hêzên biyanî.

Çunkî "ramyariya cîhanî" wekî (Morgentau) di kitêba xweda "ramyarî li nav bera gelan" li laperê 40 êda dibêjit: "Pêtir ji dîroka nwî û rwîdanên wê vedigirt, yê lê binerît dê xwe bînit, dorên (çuralî) wî hemî dîmenên hevçerxin... dihêne guhorîn di awênada, û wekî sûrbûnek li ser hebit. Nakarêt cihekê xwe ristî bibînit da li ser rawestit, yan tiraziya bibînit da pê bikêşit, eger cewherî nebin ku bo diyar dibin di zincîra rwîdanên nwî yên di dîf yekda rwî didin û pêve ristina wan di gel demê borî yê kevin û diruyên mirovayetiyê yên siruştî yên herdem heyn, ewên ku nuhe jî heyn, û li demê borî jî hebûn"

Û (Morgentau) di heman(64) jêderda li berperê 61 ê dibêjit: "Politîka ji derve û ji navda, bi rastî ji bo bidestve anîna destelatiyê ye, û bi tinê bi kawdanên cuda rastve dibît yên ku şerenîx ji ber dihête kirin di warê cîhanê yê nav xwe yîda wekî êk".

Li ser milletê Kurd pêtivîye vê cudahiyê bizanit û stiratîjîyeteka gogirandî û rind ya gelek hwîr bo xwe danît ji bo çare serkirina parçe kirinê û şerenîxê di yek demde, û sexletên taybetiyên van şerenîxa binasit û di kawdanên nuhe bigehit ji aliyê tektîkîve. Herwesa şorişa dîmukrasî divêt çonyetiya(65) paqijkirina Kurdistanê hebit ji rijêmên Kurdistan dagîr kirî, û ji derebegiyê, û hêzên dibine palên biyaniya û ji hêzên kevne perist û xudxwah yên girêday bi împiryalîzmê ve. Ev şorişe dikevîte milmilanê di gel hêzên neniyas, ewên divên parçe kirinê bihêlin, û dijî rizgarbûnê dirawestin. Ev çende tevnekê alizî di înite pêş her hewdanek di şerenîxêda werîsek pêve di hête girêdan, da

pêşveçûna şorişa politîkî û komelayetî û aborî û rewşenberî û mirovayetî pê gîro bikin û asê bikin.

Bizava azadîxwaza kurdî, divêt bizavek dînamîkî bit, paşe roja xwe bibînit girêday bi aliyê pêşve çûnê.

Pêdiviye rêkxistinek şerker hebit, jibirî(66) şiyanên şolî di katên sivik û di katên pegîn û karesatada hebît. Û ya liçik (67) (peyt) bît bo hemî kawdana bêy lerz û bê xwedana paş hîndî çav zilqutanekê jî.

Hevbendî di giringin, lê serxwebûn giringtire, eger hevbendî wekî serborên bi serê me hatîn; bizava azadixwaza kurdî bikite goriya hîndeka, û taktîkê lê bikete stiratîjîk, baştire desta ji wan rengên hevbendiyê berdîn, çi ew hevbendî di rastro bin, yan di çepro. Çunkî bizava azadîxwaza kurdî gorepana xwe kêm kirin û milkeçîyê nîne.

Eger hevbendî di taktîkî bin, û serxwebûn û şorişgêrayetî û dînamîka bizava me biparêzin, hîngê ew hevbendî di pêdivîne û çona di navde başiye.

Bizava azadîxwaza kurdî bizava milletekê jar û tepesere, dibit, di gel gelên evîndarên azadiyê bijît. Û stiratîjîka vê bizavê, dibê bihête wekî vî milletî divêt û wekî berjewendiyên wî dixwazin.

Li ser bizava kurd fere, xwe ji, xwe şirînkirne, û xwekêmkirinê biparêzit di gel dewletan, çi sermayedarî bin. Yan sosyalîzmî. Eger dît dewletek ji wan dewleta alîkariya wan rijêma diken yên Kurdistan ê dagîr diken.

Yekgirtin û hêza milletê Kurdî riya politîka dewletên têkeliyê di gel dikit, destnîşan dikit û vedibirît.

Pêdîviye di naveroka politîkê bigehîn ne wênê wê. Çunkî eger mezanî, şîn şîne, û sûr sûre, bêy têbigehîn çi li pişt van renga heye, em dê riya xwe berze keyn li navbera şîn û surîda, û dê gorî xwetêgehandina hinde kêt dî bîn li ser pişka (hisaba) bizava xwe.

Dibê bizava azadîxwaza Kurdî bi baştirîn rêkxistin şolbiket û bi rindtirîn wên yek bigrît. Û çend pitir ya ser bixwe bît baştire.

Dibê pişta xwe bi warê milletê xwe yê civakî. Û bi çînên şorişgêr gerim bîkeyn. Û pêdîviye xandinek zana û zanistî bihête danandin li ser warê gelê Kurd yê lêkvekirî û jêr dest. Û kawdanêt rojhelata navîn û sîstema cîhanî bihête helsengandin[68]. Û rê bihête neqşandin daku hêza ramyarî bêxîte bîzavê wek hêzek nîştimanî û dîmukrasî û pir bawer bi armancên gelê Kurd li nav bizava azadîxwaza gelên bindest.

Wediyare em ji berêk diçoyîboyn li bin sîbera şorişên Kurdî yên serhildayn, ji bo bizdandina zincîrên bendegiyê. Eger hestê berpirsiyê[69] nema bendegî dê peyda bît, hîç mirovek serbestnîne eger hest bi berpirsiyê neket. <<Azadiya mirovî>> wekî (Bîxofiskî) di kitêba xweda (Mirov û Civak) li berperê 50 ê da dibêjît: "Mirov û azadiya xwe êk parça pêkveristiya jêk veneboye, çunkî erkên civak û xelk û hindek mirov di êxne ser mila, erkin ji xwera peyda dibin". Dibê xelkê Kurdistanê bizanît; Çu berhelistî yêt çekdar û bizavêt şoroşgêr nînin, eger tiyoriyeka şorişgêr nebît. Û çi kawdanêt serheldan û bizavê nînin ku herdem serkeftin behra wan bît. Li nav gêjoka berjewendiyêt rojhelat û rojava da, eger êkgirtineka bîr û hizra nebît daku xwe li gorepanê diyarket û xwe bînine pêş.

Mebesta min ji tiyora şorişgêr ew nîne, ku çarçovêt mirî ji vê felsefê yan wahe bîhêne helgirtin û bikaranîn. Çi ew çarçove di başbin yan di nebaş. Lê mebesta min sûd wergirtine ji yasayên giştî yêt tiyora şorişgêr, û bo hemî kawdanên şorişa Kurdî ya nîştiman perwer û dîmukrasî bikêr bihên. Bi helgirtina tivengê bi tinê welat û millet nahêna rizgarkirin. Nexasme eger bizanîn ku gelek jwan ewên

tiveng helgirtîn nizanin egerêt helgirtina wan tifenga çîye. Ji bilî ku yêt dijî dujminekî dicengin.

Tiveng ya pêdiviye kesek tê bigehît, egerêt helgirtina wê bigehît, pêdivî çekekê tiyoriye, daku tiveng bibîte bazoke li nav cavêt dujmina. Tivengê divêt ew kesê wê dihelgirît nebete nav dujminî. Tiveng çekekê miriye, bêgiyane, teziye, helgirê wê hizrek sax û germe. Tiveng pîçeke ji gelekê, pîçeke ji şorişeka dîmukrasî ya millî ya mezin. Û mirov tivengê ji bo azadiyê dihelgirît. Dihelgirît ku di pêşkeftinê û azadiyê newek heviyê nehemganiyê digehît. Hîngê jî pêşvediçît ji bo rizgarkirina gel û welatî.

Êk ji nedrustiyêt bizava azadîxwaza Kurdî ketî têda ewe, ku bi tinê pîşta xwe ya bitivenyê gerim kirî di Kurdistanêda û bi tinê li nav cihê şorişê. Bêy ku hizrêt xwe bikit li dujminî bidet li cihêt wî, û li mala wî. Û herwesa ta raddeyekî giringiya ramyarî û rêkxistinê li nav bajêranda ya ji bîr xwe birî. Û alê piropagenda û rageyandinê li dervey welatî pwîtek baş pê nahatiye dan. Herwesa livlivîna dîplomasî di cîhanê da. Cengê derûnî dîsa pir giringe di van kawdanêt cîhanî û Kurdistanî da, pêdivîye pwîtek zanistî, mezin pê bihête dan. Bi rengekê giştî Kurdistan bi dijwarî ya toşî politîka warê sûtî boy. Û li Kurdistana jêrî ya ku dibêjnê (Kurdistana Îraqê) ev politîke neqşek bû di kongira heştêda ya parta Ba´s hatibo danandin berî cengê Îraqê û Îranê dest pê bikit. Û li dwîf wê biryarê, dibê xelkê Kurdistanê li Kurdistana jêrî(70) ya dagîr kirî, ew xelkê gelek bi erdê Xweve nwîstî, bikene mêhvan li ser warê wî. Mêhvanên bê war û bêwelat. Û piştî ev biryare hatiye bi cih înan. Gund li Kurdistanê neman da ku hêzên Kurdistanê wekî berê dinavda bi bizivin.

Ji ber hindê pêdiviye û fere bizava azadîxwaza Kurdî taktîka xwe biguhorît. Ji cengê sîng û sîng bo cengê partî

zanî. Û hêza supayî û aborî ya dujminî bimêjin û bivegivêşin. Û rêkxistinên xwe yên ramyarî linav bajêran bi hezbêxin. Û li nav bajêran bicengin, taku gorriya şorişê digehîte hemî bihosta li Kurdistanê. Û hemî bihosta li welat û cihên dujmina û dagîrkera. Daku hemî hêzên Kurdistanê û alîyên dîmukrasî perwer yên dî bikevne dilêdana dujminanda. Û hîngê dikarîn hemî şîyanêt şorişê bêxîne di cengekê şorişgêrîda, daku dagirkirinê û zordariyê ji rih û rîşala helkêşîn û nehêlîn. Da bivan hemî erkan rabîn, divê rêkxistinek cemawerî ya şorşgêr hebît, ya ku hêz û şiyanên xwe ji xelkê xwe werdigirît li bin sîbera serkêşiyeka jîrane ya mukimda, û li bin ronahiya tiyoreka zanistî ya rastda, ku bibîte karekê rojane yê şorişgêr di bizava şorişê da, û di warê ku pêdivîye bihête guhorîn ji hemî alave yêt ramyarî û komelayetî û aborî û rewşenberî. Şerenîxa çînayetî û şoriş ji guhorînêne. Gorîna bendegiyê bo serbestîyê, û pwîtepênekirinê bo berpirsiyê, û şepeşerî û aloziyê bo sîstem gîrî û başiyê, û jarî û jwîriyê bo xweşî û rastiyê û ceng û jêkbelavbûnê bo aştî û tenahî û yek bûnê.

Otonomî wek karek dirustkirin çu cara nabît fêqiyê dirust yê şorişê. Fêqiyê şolêt dirust kirinê wekî millîkirina petrolê yan çareserkirina çandinê, û komgîriya(71) karkeran, dibît bixebateka sivik û sist bihêne bi cih înan. Wekî van çêkirin û dirustkirina Ba´siya hindek kirin. Bo nimone, paşî guhorîn, paşî gotin paşî nivêsîn, paşî ji binbirin! Û herwesa şahê Îranê yê gorbegor û şorişa wî ya (sipî) û dîmukrasiya parta wî (rastaxîz) ev hemî kare encamdan.

Yan wekî dîmukrasiya bizava busilmana li Îranê. Yan bizava şofînî li Turkiyê, û şwîtika erebî li soriyê. Eve hemî dîmukrasiyêt kuştin û xendiqandinêne. Aya hindek hêzêt kurdî û erebî, turkî û farisî van rengêt dîmukrasiyê dixwazin da otonomî di navda bijît? Yan van hêza divêt ordu-

gayêt zîndankirinê û şolêt giran dirust biken wekî naziyan û faşiyan?

Yan jî divêt ordugayêt mişextan li Îranê û Turkiyê mişetir biken! Qeşe û metranêt çerxêt navîn bê gunnehiyê di firotin daku bizotên agirê cengê pê bêşbiken(72). Û melayêt Îranê kilîlkêt behiştê didane şerkeran li cengê Îraqê û Îranê û serjêkirina kurda, û maqwîlêt Ba'sîya ceng kire Qadisiye, û bombayêt jehrawî û şîmyayî berdane ser serê zarokêt Kurdistanê yêt bê gunneh. Û (barunêt) kurda destê rastê di kire didestê rijêma Îraqê da, yê çepê dikire diyê rijêma Îranê da.

Gelek lîjnêt çareserkirinê di nav rêzêt şorişê da dirustbûn berî karesata û piştî karesata, berî cengê Îraqê û Îranê û piştî hîngê. Û encamê hindê bu mişexitbûna sedhizara bo Turkiyê û Îranê û Soriyê û Îraqê û Ewrupa. Li vêre pirsyarek xwe diavête zakî (meydanê) dibêjît: Aya lawaziya şorişên kurdî û nehemganiyên wan ji egera nebûna van dirustkirina yêt ku serkeftin nedîtî di nav hinavêt civaka Kurdistanê ya ji merk coyî da bu?

Aya dirustkirin (form) dikarin pêşveçona diyalêktîkî di nav leşê şoresêda çê biken?

Bi hîzra min çu dirustkirin nînin ku bişên milletê me ji nav paşkeftinê qurtal biken. Û dirustkirin hindek mirovêt bê berpirs û serberday û bê pwîte naken armanc bo guhorînê.

Hêja (Mesûd Muhemmed) di kitêba xweda <<Zivirandina hemberiyê bo teraziyeka alîseng>> da dibêjît: "Evca dîroka me ma bê pejanê parastinê û xwegirtinê, û em mayne bê şol dizakê(73) serbilindî û xweşiya rizgarbûnê ji qeydên dîliyê. Û ji bilindiyê çavên me keftine ser kursîk û meznahiya bike û ne keda, û ji vê çendê hindek wate çûne di nav gotin û ser hatiyên folklorê meda,

hizra me, hebûna me ya hevbeş ji bîrkir ji bilî vegêrana kêmatiya li ser me bixwe dê bînî gotinek ya hey bi kurdî jî û bi zimanek dî jî nebaşiyê li ser kurdan dibêjît ev gotine me ji hêlên berî xwe ya wergirtî, lê ber û vajî wê gotinê tu çu namêzî derbarey hebûna giştî ya kurdî". Netewa Kurd netewek hêjaye, netewek jêrdeste, lê hêjabûn û jêrdestî û kedxwarî bitinê şorişê nabine pêş. Fere hêzên şorişê yek bigrin, û ji xwera politîkekê deynin girêdan bît bi stiratîjîkêve, û diplomatîkek girêday bi şiyanê ve politîkek xelkê Kurdistanê bi arînît di çarçova rêk xistineka êk bîr û bawerda li bin serkêşiyeka komî ya jîr û jêhatî, ya bişêt riya xelkê Kurdistanê ruhn biket bo bicihînana "Mafê çare nivîs yê gelê kurd bi azadî û bi serbestî li ser welatê xwe Kurdistan". Û şorişek kurdî dîmukrasî, cengek cemawerî bo demekê dirêj dîplomasiya me bibete pêş û digel hemî gelan bijîn li ser bingehêt wek hevî û hemberiyê.

Bizava azadîxwaza Kurdî parçeke ji şorişa cîhanî ya hev çerx û ev bizave dibê di vê çeperîda bît. Û mafê rexnegirtinê yê hey beramber tayên bizava cîhanî, ji taya partên komonist û dewletên sosyalîzm daku rêzên xwe dirust biken wekî dibînîn rexna bizava kurdî ya dirust û di cihê xwedaye. Lê ev çende di babetî nabin eger bizava azadîxwaza Kurdî xwe li warê hêz û şiyan û pêşkeftin xwaziyê nebînit, daku mercên xwe pavête ber aliyên dî li ser bingehê berjewendiyêt hev beş. Çunkî şoriş di van rojanda wekî pirofîsor (Yorîkirasîn) serokê zankoya zanistên cîvakî ya ser bi komîta nawendî ya komonista soveyetî dibêjît: Hizrekê li ser me didanît û nebitinê biteraziyêt politîka nîştimanperwer, lê biteraziyên politîka cîhanî jî.

Gorîkirina serxwebûna Kurdistanê û azadiya gelê Kurd sexmeratî vê bizavê yan wa he, evê dewletê yan yadî, vê bizavê yan êkadî, divêt nehête pesendkirin wek bîr û ba-

werek stiratîjî.

Pêkveristina bizava azadîxwaza Kurdî digel bizava cîhanî ji hizra azadkirina Kurdistanê û mafê gelê Kurd bo çarenivîsa xwe dihêt.

Rojnamegêrekî pirsyar ji serkêşê Vêtnamê yê zîrek û bi nav "Hoşî Mine" kir, ku bizava azadixwaza Vêtnamî gefeke li ser aştiya cîhanî. Bersiva wî: Eger aştiya cîhanî li ser behra azadiya gelê Vêtnamê bît bila cîhan bisojît.Divêt bihête zanîn ku; mirovê Kurd nahête rizgarkirin eger welatê wî Kurdistan nehête rizgarkirin. Serbestî bi axêve girêdayîye, ev rastiye dixazît lîste gîrîya gelê kurd, hêjatiya vî gelî, hemberî û wek hevîya wî digel gelên dî li ser bingehên serbestî û rastiyê bihête kirin.

Û pêdiviye bingehekê lêkolînê yê Kurdî bihête dirust kirin, gelek zanav û pispor û şareza û kadirên Kurd têda bîkevna şolî daku politîka êmnahiya neteweyî ya Kurdistanê bi gotina wan bît. Û ji bo gogirandina(74) hîzr û bîr û zanîna xelkê Kurdistanê şol biket. Pêdiviye em gelek di hişyar bîn dane kevîne dinav herî û teqna împîryalîzmêda, ta eger rijêmek pêşkeftîxwaz dij împîryalîzmê jî li ser kursîka dewletekê ji van dewletên Kurdistan dagirkirî bît.

Em vê çendê dibêjîn ku nuhe rijêmek wesa nîne, çunkî eger heba da bêjît gelê Kurd mafê çare nivîsa xwe yê hey li wê parça Kurdistanê.

Îro ji gelê me yê kurd dihête xaztin, daku kongirek stiratîjî girêdet, û hemî rêkxistinên şorişger û dîmukrasî pêşkeftinxwaz li Kurdistanê beşdariyê têda biken. Daku rêzêt Kurda bidene hev û nakokiyêt xwe biden aliyekî û kerb û kwîn û berjewendiyên partî bazî û eşîrî yêt berteng ji bîra xwebiben û da çekî di şerên bira kujiyêda bikarneînin. Çunkî hemî yêt xendekekê da û dijî dujminêt kurd û Kurdistanê di cengin.

Herwesa ji gelê me dihête xwaztin da encomenek[75] nîştimanî Kurdistanî ji xwera danît yê pêk hatîbît ji xudanxîret û şorişgêrêt zehmetkêş û rêncber û zana ji endamêt parta û bê layena, daku serkêşiya xebata gelê Kurd biken.

Û lîjneka peywendîyê ya şareza li ser politîka cîhanî berpirsyar biket da karê dîplomatîkî bibete pêş, û pewendiyêt bizava azadîxwaza Kurdî di gel bizava azadîxwaza gelan bihêz bêxît, li ser bingehêt yek naskirinê û hemberiyê cengek cemawerî dirêj helêxit ji bo rizgarkirina hemî parcêt Kurdistanê. Û pirsa kurdî bi havêjîte nav dan û standinêt cîhanê. Wek hebûnek êk girtî ku nahête jêk cudakirin û mil keçî nahête kirin bi çu loqa.

Dibê van armancêt qonaxkî yêt şwîtka stiratîjiyê li dorweranî bihêlîn û xwe di ser ra gav bideyn û kolana stiratîjîka dirust bîgrîn "Mafê çare nivîs bo gelê Kurd li ser axa Kurdistanê bi azadî û serbestî"

(Firêdrîk Hirtiz) di kitêba xweda (Netewe di politîk û dîrokêda) di ber perê 276 êda dibêjît: Hizra çare nivîs çar tişt yê di nav xweda heyn:

1- Tiraziya destnîşankirina regezî.

2- Çonyetîya gotin û peyda bûna xwe dibiya (îrada) neteweyî.

3- Mebestên xwedibiya neteweyî û sinurêt[76] wê.

Û dibît gel wek milletek bihête diyarkirin li ser bingehê deverê yan yê etnugrafî wate:

Gel xelkê vê deverêye, yan hindek kesin bêy pirsa deveratiyê bidey berçavan, wan sexletên etnografîyêt diyar kirîyêt heyn.

Firidrîk Hirtiz di per perê 275 êda dibêjît:

<<Çare nivîs wate: gel bixwe rêberiya xwe ya dumahiyê diket bêy ku biyanî mayê xwe tê biken. Ji ber ku herêm bi

hizra gelve ristiye, wate mafê bikarînana deverek diyarkirî ya hey>>.

Hirtiz diyar diket ku çara nivîsa xwe xweyî li ser çonyetiya dirustbûna xwedibya (îrada) neteweyî û gotina wê di rawestît. Deng dan û helbijartin wek rêyek peyda bû ji bo bicih înana mafê çarenivîs lê wesa diyar bû ku dengdan ji hindek cara bi dirustî îrada (viyana) xelkê dernabirit, ji ber tirsê.

Bo nimune li ser vê çendê, dengdanên Napilyonê yekê û duwê û Hêtlerî. Çunkî çare nivîs pêdiviye xelk yê serbest û azad bit. Da bişêt gotina xwe bi bistehî bêjit bêy tirs, lewma dibînîn hindek gela ya xwe daye di gel hindekêt dî bi şêwên fêdralî di nav sinûrên yasaya cîhanî da.

Xelkê Kurdistanê bihevra dikarin karek pirr baş û sipehî encam biden. Eger rêberiyek xort û jîr ya bidilê wî xelkî serkêşiya wî bikit. Wate; wekî ew xelk bihevra di kevne îş û karê xebatê dikarin rêberiyek xort û jîr dest nîşan biken, da karwanê xebata gelî bigehînite armancên wî.

Raste mirovên zana û şorişgêr buhayê wan gelek giringe lê pêdiviye mirov peristî nemînit çunkî ev çende rêkxistinê têkdidet û şolî diherimînit.(77) Herwesa dibîte pejan dirêya kar û barê spehî yê xelkê xebat kerda.

Erê gelo milletê kurd bi serkêşiya partên xwe yên xebatker ve şorişên Kurdî helkirîne û peqandîne navçavên dijmina, daku şwîna xwarna goştê xav bi nînûka û didana, goştê kelî bi çengal û çeqoya bixun? Yan jî ev şorişe helkirîne da ji bin darê zordariyê rizgar bibin û şerma bindestiyê ji ser xwe bi helînin?

Gelê Kurd şorişên xwe yên helkirîn ji bo armancek pirr hêja û pirr mezin ji bo azadiyê. Lê bi rastî azadî jî ne armanceke di xwe bixwede "azadî ne rizgarbûne ji" "azadî ji bo armancekê" ew armanc rizgarkirina Kurdistanê û mille-

tê kurde ji bo sûda çînên tepeser.

Me azadî bi dîtina kilasîkî nevêt şiyan û neşiyan di şolekî ji şolanda, yan jî mirov çawan hez biket wesan baxivit. Herwesa mebest me pê bi azadîyê kwîr hizir kirin nîne di pêdiviyaten civakîda. Çunkî ew azadî azadiyek pwîçe. Wekî dibîte gaziyek ji bo viyan û neviyana helbijartinê daku mirov "EZ" bit û dwîvelankê mîratiyeka bîyanî bit yaku Kurdistan bi hêza supay û bi darê zordariyê êxistiye bin çengê xwe(78) û yasayên binavê serbestî û azadiyê derd diêxît û li ser xelkê meyê jar belav diket. Azadiya me divêt. Azadiya berpirsyare beranber gelê kurd û zivrandina jîna civakî ji milletê Kurdra, û nehêlana zordariya komelayetî û ked xwariya aborî û hizrên eşîrî yên rîzî û rizgarkirina erdê meye.

Hîngê helbijartin karek rewane bêy ku asteng bikevîte di rêda, çunkî qeydû zîncîrên diliyê di hêne pirtikandin. (Bîxofiskî) di kitêba xweda (mirov û civak) li ber perê (70-71) êda dibêjit: <<Civak sîstemek vebiriye, ji bo peywendiyên civakî, hebûna xwe di nav xweda ya hey, bêy ku îrade yan hizra mirovan yek yek bidî berçavên xwe. Lê pêşkeftin bi rêya wan kesane yên ku boyne endam dinav civakêda. Herkesek wekî ji dayîka xwe dibit dibite endam. Lê digel dijît li bin yasayên civakî yên ku civaka mirovayetiyê rêk di êxin>>

Seydayê hêja "Mesûd Mehemmed" di kitêba xweda yaku berî nuhe me navê wê anî di ber perê 57 ê da dibêjit: <<Me pêşvaziya(79) vî demê nu û pirrî raperînên hemî reng û cor kir yê ku hindeka ji wan xwe di ser mafên neteweyî ra dihavêt bo mafên civakî piştî bîst û şeş çerxên wêrankirina şiyanên kurdî, ku neşyayn pirekê li ser biçûktirîn rwîbarê xwe danin ji vî alî biçin alê din>>.

Çima nabit Kurd pirrî viyana netewê xwe bin?.. Çima nabit serşoriyê qebûl nekin? Û bi dirustî di hizra pirolîtariya nav neteweyî negehiştin. Lê hindek partên komonist yên berze û nihê-

nî. Yan jî yên di kursîka biratiyêda rûniştîn di vê rastiyê nagehin. Ew Lênînîne pitir ji Lênînî û di gel hindê kesek neşêt bêjit ku Lênîn îdyalist bû, û her ewe yêku aşkera û bê tirs digotarê xwe yê binav û dengda "Derbarey kerameta neteweyî ya rosan" da gotî "Em di tijîne ji kerameta neteweyî, û ji berhindê me mil keçî bo demê[80] borî neviyaye, û herwesa em hez milkeçiyê bo demê nuhe nakîn" Herweha dibêjit: <<Ew bendê di bendegiyê da ji dayik dibit nahête lome kirin, lê ew bendê bendegiya xwe ciwan diket û na xwazit xwe jê qurtal bikit, ew bendek pirr pîs û herimiye û ji hejî neviyan û dil reşîyêye>>.

Lênînê nav neteweyî derbarey pirsa neteweyî di jimara 44 ya(Ayskîra) da dibêjit: <<Serxwebûna neteweyî negirêdaye girêdanek nehête vekirin ji berjewendiyen çînayetî yên pirolîtarya xebatker, ku ferbit bizav bihête kirin ji bo bidestve înanê bê merc di her kawdana da bît>>.

Ew şorişa millet hemî pê radibit ew bitinê dikarit şorişek bi serketî bît>>. Lênîn ho dibêjit. Mirov dişêt vê bikite nîşana semekeftina şorişa kurdî ya pirt pirt û ji berêk çoy, wekî diruşmê kirêtê otonomî dihelgirit û peywendiyen xwe bihindek kesan ve girê didin bêy ku behrek di wan berjewendiyada hebît.

Lênînî daxwaz ji pirolîtarya kir daku baweriya xwe bîden bal cuda bûna nerwîcê ji Siwêdê. Û jê xwast daku zoxandinê[81] bikin dij helgirtina nerwîcê bî zorî, wekî reben û maqwîlên gunda diviya.

Lê maqwîlên me pirûpagenda berfireh dikin daku Kurdistan bimînit parçek ji wê dewleta Kurdistan bi agîr û xwînê dagir kirî.

Û divî demîda Marks xwe xerîb dibînit û dibit di vê rastiyê gehiştibit wekî daxwaza cuda buna Êrlanda ji Ingilistanê[82] kirî. Herwekî Lênînî di gotara xweda

<<pirolîtariya şorişgêr û mafê çare nivîsa gelan>> yê ku belav boy di kitêba <<nivêsîn derbarey pirsa neteweyî>> li ber perê 146 ê diyar kirî.

Milletê me yê Kurd daxwaza rizgarkirina Kurdistanê ji dagîrkirinê dikit. Karê rizgarkirinê karek pir hêja û pêşveroye di mêjoya kevn û hevçerxda. Lê politîka çewsandin û tepeserkirina neteweyî "Politîka cudahîya gelan û milletane".

Li kanûna diwê ya sala 1914 ê Lênîn di "Neqşê berçavkirina pirsa neteweyî" da got: Pirsa neteweyî pirsek cîhaniye. Dibê bihête wergirtin di barê dîrokî û aborîda. Hezjêkirina neteweyî nîşana şorişa dije.

Daxwaz kir ku deverên neteweyî bibne yek (vejîna Zimanî, hişyarbûna neteweyî H.t.d[83] û avakirina dewleta neteweyî pêdiviyatiyeka aboriye).

Lê çima hindek bazirgan di cîhana me ya nuhe da, milletê me yê kurd gunneh bar dikin demê yekbûna xwe dixwazit? Xwe peristiya van jîra, tê gehiştina wan ji bo serbestiyê kûre kir. Çunkî ew kesê di pirsa neteweyî negehit di kolana azadiya milletan û mafê çarenivîsa wanra, ew di pirsa gelan û pirsa azadiyê û navneteweyiya prolîtariya negehiştiye.

Gelî bira, dagîrkirinê ev xweliye ya biserê me werkirî û ev hemî kul û derde yê ji mere çêkirin. Dagîrkirînê nedikarî vê hemiyê di gel me bikit eger hindek kes her ji me bi xwe nebane xizmet karên wê. Evan kesa milletê me yê bê rûmet kirî. Û xuh û xwîna rêncberên me dayne mêtinê, taku heryek ji me di cihê xweda libirayê xwe boye dijmin û kerb û kwîn jêk helgirtin.

Ee milletên milkeçiyê bo dagîrkera dikin ew nama bendegiya xwe muhr dikin. Ji ber vê çendê di bê bizava azadî xwaza kurdî kêşa xwe bi destê xwe bigrit. Çunkî bitinê êş

û derdên milletê me hemî wan hêcetên pwîkên dîmukrasî û otonomî dibirin. Ew hêcetên dibine egera berdewamiya dest dirêjiya dijmina li ser milletê me. Yan paşdakêşana hêzên dagîrker , yan jî şoriş dê ya berdewam bit. Babetê erdî babetek niştimaniye, babetê dîrokêye, babetê şeref û jînêye. Kêmatî û milkeçî têde nahête kirin. Jîna me û şerefa me parçeke ji Kurdistana me.

Hêzên pir şiyanên derûnî yên milletê me hêviyên ciwan û hêja û mezinên vî milletî ava dikin. Ronahiya hizrên gelê me dê karwanê baweriya here giring divan kawdanên nuheda ne ev harîkare yan ewê heye, ne ev kempeye yan ya diye, lê baweriya mezin û hêja ewe ya bi milletî pişt germ û mukim bit. Paqijtirîn serbestî û azadiya em têda bijîn û şol ji bo bikîn, nebitinê azadiya rojhelat û rojavaye. Lê herwesa azadîya nîştimanê ku ji bo wî xebatê dikîn. Ji ber vê çendê nabit hîç kurdek xwe bidit paş, çunkî xwedana paş kêmasiye beramber milletî û şerefê û hemî erkên mirovayetiyê.

Hindek kesên dî yên heyn, zimanê xwe dirêj dikin ser birayên xwe, û ew dizanin birîndarkirina bîra bizimanî û gotinên nexweş, dîwarên milletî pê ava nabin, lê şiyanên wan bixwe û yên hemî gelî pê sist û wêran dibin. Ew şiyanên ku nuhe milletê me ji hemî tişta pitir pêdivi wane. Pêdivî yekbûna hemî rengên çekiye, yên ramyarî, supayî, aborî, rewşenbîrî, derûnî, komelayetî, û hemî dijî bingehên dijmina bihêne bikar înan.

Em di pêdivîne perdê ji ser netebayên xwe bihelînîn û rexnê li alozî û nedirustiyên xwe bigrîn. Daku bişêyn çare bikîn û van alozîya û nedirustiya nehêlîn.

Xwe naskirin dê hizrên me gogirînit û baştirîn rê dê nîşa me dit ku pê bigehîne armancên xwe, yên hêja û mezin bi destve înana çarenivîsa xwe û bi cihînana dîmukrasiye û

sosyalîzmê, ji bo me û ji bo zarokên me, da giyanê pakê şehîdên me, di dil xweş bin û bi tenahî di nav gorên xweda, di nav axa pîroz da, di nav hinavên Kurdistanêda akincî bibin.

## Got û bêja riyalîst royî û îdyalîst royî

Diyarda (zahîra) hizra "pêşkeftinxwaz" yê hindek rijêmên Kurdistan dagîrkirî, û neweyiya hevalîniya wan rijêma bo gelê kurd û dehol qutan û gotin û pirûpagendên şorişgêr, eger bi rastî û dirust bit; ji neweyiyên xelkê kevin derbarey şirovekirina hebûna birûsiya û hewra û şev û roja, gelek di cuda nînin. Lê tiştê ji hemiya nexweştir hindek serkêş û serokên kurda wekî peywendiyên derve şirove dikin, vê hevalîniyê bi hevalîniyek stiratîjî dizanin. Û tiştê kenî-girî pêbihêt ev renge efsane biçûktirîn alozî bo wan seroka peyda naken beramber kêşên asê û alîzî, çare serîyên tahil (tal) yên dikevne di rêya wan da.

Dîrok nivesê Ingilistanî (Pawil Conson) î diyar kir ku, "Nave roka zanista cugrafiya politîkî, şiyana cuda kirinêye li navbera pileyên hemî rengên xirabiyê". Ji ber hindê pêdiviye gelê me bizanit ku hemî rijêmên davê zordariyê li hindav Kurdistanê ragirtî û Kurdistan dagîr kirî, ew dixwazin kurda mijwîl bikin bi hevpeyvîn û hevalîniya bi direw daku bikine perde û, libin wê perdê berdewamiyê bidine dagîrkirina xwe.

Wekî dujmin destê rastê bote dîrêjdikit tijî destê xwe yê çepê toz û xweliyê dihelgirît da bihavêjite serçava. Rijêmên Kurdistan dagîrkirî, herdem bikarên zordariyê û hovî radibin. Çunkî wan baweriya bi serkeftina xwe hey.

Ne bi tinê tuxwîb û merzên cugrafî yên bidest hatine çêkirin û Kurdistan kiriye çend parçe, ne bi tinê ew tuxwîb ziyanê digehînine milletê me, lê hindek tuxwib û merzên dî wekî dijkî û berjewendiyên êlî [eşîr) çinayetî yên di nav meda heyn me di êşînin û ziyanê digehînine me. Herweşa tuxwîbên eşîrî û xwe peristî û paşkeftin û nezanînê û

tuxwîbên tirsê ji girêdaneka kongireka stiratîjî bo yekgirtina rêzên bizava azadîxwaza gelê me. Tuxwîbên tirsê ji serbestî û azadiyê û ji destdana serokatiyê. Tuxwîbên gogirîna hizrên civakî yên ku me di gehînine azadî û serxwebonê.

Hindek rêkxistinên kurdî diruşmê otonomî bilind dikin di çerxê azadî û serxwebonêda. Di çerxê veçixîna sîstemê kolonyalîzmî û hêrişa împiryalîzmî û berfîreh bûna berjewendiyên dewletên mezinda.

Ev diruşme (diruşmê otonomî) yê nerimtire jiwan diruşmên serokên kurda berî yek çerx (sedsala) heldigirtin. Pêşewayê kurd nemir Bedirxan Beg û şêx Obeydulayê Nehrî hizra serxwebûna Kurdistanê di îna pêş û ji bo bidestve înana wê armanca pîroz xebat dikirin. Şorişgêrê kurd şêx Mehmûdê Hefîd û şêx Seîdê Pîran û Qazî Mehemedî hindek bînyatên wekî serxwebunê bo kurda dadinan. Û pêşewayê nemîr Mustefa Barzanî dîtina ji tuxwîbên Kurdistanê yên bidest hatîne çêkirin derbaz dibû... Ew ser kêşê hemî milletê Kurd bû. Umêda wî serbestî û azadiya vî milletî bû. Lê xudê jê razî li pişt komeka rewşenbîrên Kurd berze bi bû. Evce stiratîjiya serxwebûna Kurdistanê guhurî û kîre "otonomî". Kurda çu hevalên bi rastî nabin eger nebine êk. Wekî gelê Kurd hebûna xwe xuya kir hîngê dê heval jî hebin. Nîkson î di kitêba xweda "Aştiya bi rastî" di ber perê 96 êda got: "Hemî serok beramber çavkên kamêra li aştiyê di geriyan, lê li pişt devên dayêxistî dizivrîneve ser rastiya xwe; (zordar û lêkirî) (Kêtik û mişk) (nêçîr û nêçirvan) (kêbir û kênebir)"(84)

Peywendî di gel dewletan şanogerî nîne, herwekî mirov di çîte di nav lehenda(85) şêrîda, ji ber hindê ewê hevrûniştin û hevpeyvînê diket dibê yê şareza û netirs bit.

Nîkson her di wî jêderê jorîda li berperê 40-41 ê da

dibêjît: <<Hîç serokekî mafê kombonê di gel neyarê xwe nîne, eger bi dirustî bingehên hêz û şiyanên xwe û yên neyarê xwe ne niyasit û nezanit, û eger tiştek nebit, da kêmatiyê (musawemê) li ser biket, yan kêmatiyê pêbidet kirin. Û eger yê amade nebit hindek şareza wî birêve biben>>.

Hindek dewlet pêtir ji hevalîniya me ditirsin wek ji dijminiya me. Çunkî ew netebayên kar li ser me diken, me pirdikin ji êş û jana û hevalîniya hosa dê ya bê fêqî bit.

Eger me bawerî bi pêdiviyatiyên êkgirtina hêzên Kurdistanê nebit û bi yek dîtin mêz nedîne stiratîjiya Kurdî me çu heval nabin.

Yê biyanî hind mêz nadite hevalîniya te hindî mêz didîtê kanê dê çi ji te vergirit. Yan kanê dê çawan şêy hevalîniya wî parêzî.

Stiratîjiyê Ingilîstanî yê bi nav û deng (sêr Robert Tombson) hêza neteweyî diyarkir ku "Şiyana mirovan + çi di hête terxan kirin + çi di dildaye bihêt kirin".

Netebayên hemî tayên markisismê di cîhanêda me kirine netebayên xwe, îna bi me kenîn û bo xwe yarî bi me kirin. Şerenîxa cîhanî li ser berjewendiyên herdu kempa (sosyalîzim û impiryalîzim) me kire kovana xwe, û nakokî li nav bera rojhelat û rojava me kire kêşe û pirsa xwe me wek îdyalîstan hizra xwe di hemiya da kir û ew diruşm rakirin yên hurr û bayên çîhanî bi serda dihên û em mayne ji bîr kirî û ketin ya me di xut û di kelojît. Em di pirîn ji îdyalîstiya Eflatonî û derniya Higilî û metiryalîstiya Marksî. Û zarokên Kurdistanê jî yê bi napalm û bumbayên jehrawî û bayolojî dihêne sutandin.

Hindek lawên me yên metiryalist di hîzr û bîra digehin wek çarçovek sar û tezî, bêy li xwe binêrin û gotina Marks ya binav û deng ya bo xwe ji ber kirî "karkera çu nîştiman

nînin". Ev gotine ya diruste wekî karker hest diket ku yê azade di civakeka azad da. Lê karkerê kurd ne yê azade di Kurdistanê da.

Çima dihêlîn milletê kurd gorî berjewendiyên xelkî bibît?.. Û boçî ji bîr xwe dibin ku mirov divêt şagirdê warê xwe bit, û hemî politîkvanên mezin politîka xwe naneqşînin eger li ser bingehê berjewendiyên milletên wan ne bit.

Politîka me ya derve divêt li ser bingehê berjewendiyên gelê me bit, ne bi tenê li ser binyatê felsefê. Çunkî ewên felsefe danay, ya danay da ku hizra pê ruhin bikin wek nîşadanek bo şolî.

Peywendiyên me di gel her parteka bît divêt di xizmeta berjewendiyên gelê meda bit, û li ser bingehê berjewendî bawerî, pêkînan û rêzgirtina herdu la bo êkû du bit... Û ew peywendiyên di gel stiratîjiya me ne guncin divêt bihêlîn û pişta xwe bidînê, wekî em hevpeyvînê dikîn, divêt kulavêt sûr û şîn bideyne aliyekî, û li pey daxwazên gelê xwe baxivîn.

Divêt me aydyolojiyek hebit rêberîya me bikît wekî em xelkê xwe kom dikîn û rêk têxîn. Di bê tê bigehîn ku peywendiyên cîhanî renga nasnakin. Û serkêşê ramyarî yê alayê sûr yan şîn radikit dinav gorepana xweda, wî ji ber hindêye bîra xelkê xwe û êketiya tiyorî û êk armancîyê bînît û xizmeta çîna xwe pê di hênite pêş. Lê serkêşê ramyarî yê di gorepana derveda şol diket, divêt berjewendiyên milletê xwe bihelgirît û bînite pêş.

Şerenîx li navbera dewletan, şerenîxe li navbera berjewendiya. (Nîkson) di kitêba xweda (Aştiya bî rastî) li berperê 46 ê li pey serbor û şolê xwe di gel dewletan dibêjit: "Rastiya here ruhin û aşkera ewe aydyolojiya dewletên mezin ne di gel politîka wan ya derveye". Ew hêzên di gel

kurda bi hevrikî cuyn eger baweriya xwe bi "Bijî û bihêle xelkê dî jî bi azadî bijît" ne înin û şol pê nekin, ev devere çu aştiyên bi dirustî û çu ne aştiyên birixmatî û ne çu êmnahiya dibînit.

Lê neweyî û efsaneyên hindek hêzên kurdî û bîyanî dinivêsin ku dibit aştiyek bihête bidestve înan li bin sîbera dagîrkirinê. Ew hêz di du rwîne.

Çunkî serok û serkêşên riyalîst yên aydyolojîyê li xwandingehên kadira di xwînin û ji wan jî serkêşên radîkal, berjewendiyên milletê xwe didanine ber çavên xwe û mezintir ji vîyana xwe dizanin û giringtir ji îdyalîst û metiryalîstan xwejî di nasin.

(Firanklîn Rozfilt) î li sala 1945 ê gote gelê emrîkî yê gelek di cengê cîhanî yê duwêda westîyay û mandî boy, gotê "Me zanî ku em bi tinê neşêyn bi aştî bijîn". Ewca ew rijêmên Kurdistan dagîrkirî bila ji serborên xwe yên şikest xwarî di gel gelê Kurd bizanin ku: Milletên wan neşên bi aştî bijîn eger milletê Kurd jî di aştiyêda nebit. Û bêy wek hevî û serbestî û azadî û dirustiyê çu aştî peyda nabin.

Hindek komên hêzên Kurdistanî (kotirên aştiyê) yên heyn, li ser binyatê otonomî di pirsa kurdî digehin. Baweriya xwe bi tuxwîbên bi dest çêkirî di înin di nav Kurdistanê da. Lê sîstema cîhanî wesan di pirsa Kurdî nagehit. Ew dibînin ku pirsek êkgirtiye li hemî parçên Kurdistanê wekî êk. Bizava azadîxwaza kurdî li her parçeka Kurdistanê bit şînwarêt xwe yên aşkera yên li ser parçên dî yên Kurdîstanê heyn. Lê "kotirên aştiyê" yên îdyalîst xwe ji vê rastiyê diparêzin û jê direvin bi navê hindê ku riyalîst û rast bînin.

Hindek komên dî yên Kurda, koma "Bazên tund ro" bi çavekê dî dinêrine netewa Kurd; Ke netewek hêjatir ji neteweyên dî û dijminatiya wan gelan dikin ku serokên wan

peywendiyên Kolonyalîzmî di Kurdistanê da akincî kirîn. Koma "Bazên tond ro" dixwazit bizava azadîxwaza gelê kurd dijminayetiya gelan û serokên wan bikit wekî êk. Ev kesne ji dervey peywendiyên cîhanî li pirsa kurdî mêzdiken û gelê Kurd di kêşne kotanek bêder. Di vêt her kurdek bizanêt gelê Kurd hevalê hemî gelane, û xebata wî bitinê dijî rijêmên Kolonyalîzme yên Kurdistan dagîr kirî û gelê Kurd êxistiye bindarê zordariyê û xwîn û xuha wî di mêjin.

Koma sêyê ya hey koma "Tirsnûk û revrevoka" dîbêjn: "Em hosa bijîn û bi halê xwe razî bîn baştire ji dest helînan û serhildan û xwe dane kuştin û mişextbûnê". Ew kesane gelek bi tirs li hêza dijminan dinêrin, lew nikarin rêya dirust ji xwere bi helbijêrin. Bizava azadîxwaza gelê Kurd ya ji kul û kovanên milletê Kurd zay û peqî û helavêtî, da berevaniyê ji hebûna vî milletê nepitir ji azadiya xwe dixwazit, hemî milletên azad di cîhanêda.

Daku azadî û serbestiya xwe bizivirînîn û berevaniyê jê bikîn em pêdivî cugrafya yêyne, çunkî cugrafya wekî ceneral (Dîgol) dibêjit: "Cugrafya, egerê mezinê çêkirin û sazkirina dîrokêye".

Milletê Kurd yê azad nabit ger li ser axa welatê xwe Kurdistanê nejît, û bêy rizgarkirina vê axê gelê kurd sax û azad û serbest nabit.

Kurdistan di nexşê peywendiyên cîhanî da, erdek lêk vekiriye, û pirsa Kurdî êke li ser vî erdî. Milletê Kurd, gelê kurd, netewa Kurd, hindek têgehiştinên jêk cudane, lê kakil û naverok ber êkin di sîstema cîhanî da.

Bizava azadixwaza Kurdî dê her her hebit. Bi cahirî(86) xwe mijwîl kirinê bi hizrên pwîçve, yan xwe bihindê bînîn deri ku rastîyê bi rastî nasnakeyn. Baştire em xwe hîkeyne jîna birênc û nexweş da bişêyn bizava xwe bibeyne pêş û

roja serkeftina xwe nêzîktir bikeyn.

Aştiya bi rastî di Kurdistanê da pêdivî polifîkeka girêday bi şiyanêveye. Ew politîka pêdîviyatên şorişa kurdî têda bin ji bo peyda kirina aştiyê.

Hêz û şiyanên Kurdî yên êkgirtî dikarin bo dijmina aşkira û xuya bikin ku; hîç sud bo wan di dijminatiya gelê Kurd da nîne, çunkî gelê Kurd herdem yê amadeye berevaniyê ji xwe bidit paş.

Lê eger dijmina berdewamî da dijminatiya xwe berambermilletê me pêdiviye şorişa me nebitinê beravaniyê ji xwe bikit, lê hêrişa bikit ser, da ku naçar bibin û rêya rast bigrin û destê zordariyê li ser Kurdistanê bihelînin. Divêt em baş bizanîn, ku dijmin zimanê dîmukrasiyê nizanin û nevên bizanin.

Hindek kes wesa di dîmukrasiyê digehin ku dengdaneke di helbijartineka bi direw daku peykêt çîna mîrkar bihelbijêrin. Ew bivê çendê dîmukrasiyê ji bingehê wê yê birixmatî vedikin, û hindek yasayên taybetî yên kawdanên Kurdistanê bi hindek tiyorên lîbralî yên biyanî ve girêdiden. Berûvajî metiryalîstan yên ku van yasa bi diruşmên tiyorîve girêdidin, û yasayên giştiyên sosyalîzma zanistî ji karê dîmukrasî vala dikin.

Divêt em dîmukrasiyê nasbikin li ser binyatê politîkî, civakî, aborî. Dîmukrasiyeka avakirî li ser azadiyê, ne li ser tirsê ji azadiyê. Bingehê dîmukrasiyê wek hemberiya hêdî hêdîye ji binî taku digehîte serî. Li ser bingehê têgehiştin û boçûna gelî bo dîmukrasiyê. Ne bizor lêdan û fişar ji serî bo binî. Dîmukrasî di bê royê wê rastî û berpirsîya civakî bit. Dîmukrasî divêt ji rwîtî û buha giraniya neteweyî û vîyana mirovayetiyê bit. Xwe şwîştin ji vê rastiyê du rwîyatiye û xwe peristiye. Çu dîmukrasiya bi rastî bêy sosyalîzim peyda nabit û çu sosyalîzma bi rastî bêy

dîmukratî peyda nabit, çunkî peywendiyeka mukim ya li navbera wan hey.

Aya dibit vî rengê dîmukrasiyê bicih bînin daku otonomî di nav da bijît? Û otonomî didine kesa nadene erdî û welatî, wekî dewleta dîmukrasî (Siwêsra) û dewleta sosyalîzmî (Yekêtiya Sovyet) û dewleta diktatorî ya Îraqê bo nimûnek tiyorî.

Dîmukrasiya "Tevav" (mutleq) armancek îdyalîste, û otonomî armancek îdyalîstî tire. Çu dîmukrasiyên tevav di cîhana me ya îro da nînin, otonomiyê rast û dirust têda bijît. Û dîrok nikarit yek nimûnê vê hizra îdyalîst bidite me, yan bome diyar kit. Lê çu dîmukrasî bêy azadî nabin û çu azadî bêy dîmukrasî jî nabin. Ew milletê rwîmetiya xwe ya nîştimanî li ser welatê xwe nebit, neşêt dilsozê dîmukrasîyê û navneteweyîyê bit.

Eger bi rastî û dirustî bît, ew otonomî yê dewleta sovyêtî daye hindek kêmasiya (hindikiya) li nav xwe, çu nexşên cugrafî bo nehatine dîyarkirin. Çunkî ew otonomî yê daye kesên xelkê yek dever, yan kesên belav li ser gelek devera di çar cova yek komar yan pitir ji komarekê ji komarên yekêtiya sovyet.

Li Îraqê di salên heftiyada serokê rijêma Îraq, got: Îraq otonomî didite kesa nadete erdî. Çunkî ewî Kurdistana jêrî parçek ji welatê erebî dizanî. Wate Kurd nîşana otonomî di helgirit çi li Kurdistanê bit, yan li jêriya Îraqê bit yan li derve bît. Bêy ku hîç mafek hebit.

Lê li siwêsra, helbet gelek axiftin li dîwanên kurdî ya li ser hatiye kirin û dihête kirin, divêt em bizanîn Kawdanên wan ji alê dîrokê û pêşveçonê ve ji me di cudane. Siwêsriyê Almanî yan yê Ferensî, yan yê Îtalî, yê li Siwêsra dijît baştir ji ku eger li Ferensa yan Îtalya yan Almanya bit. Ew yê girêdaye bi erdê xweve li nav welatê xwe otonomî li Si-

wêsra ne armancek di nav xweda ye, lê çarçovê rêberiya sîstema kantonanta ye yê ku dewleta Siwêsrî li ser hatiye ava kirin, çunkî her çar netewên serekî li Siwêsra kursîka bîrayetiyê ya di destda.

Lê otonomî wek armancek stiratîjî, wekî hindek hêzên kurdî bixweşî vedgêrin û baweriya xwe pê di înin bo êkgirtina gelê kurd û mafê çarenivîsa wî armancek pir pwîçe, çi Kurdên kevneperist pê baxivin yan şofîniyên ereba û turka û farisa. Ev kesne dixwazin bazirganiyê bi kêşa milletê me bikin û berjewendiyên xwe biparêzin.

Dê perde ji ser hemî xwe dixwe û xweperist û tirsinûk û revrevoka rabin. Wekî têgehiştina gelê me ya civakî pêşve diçit û yekbûna xwe peyda dikit û polîtîka xwe li dwîf hêz û vîyana xwe dineqşînit û xwe bi hêz û şiyan diêxit. Hingê dikarit kotirêt aştîyê pêşkêşî xelkê dî biket û bo wan xuya bikit ku dikarit gelek bi ciwanî û rindî şol bi dîmukrasiyê bikit.

Milletê yek bigrît û xwe bihêz bêxit. Dikarit bêjit min serbestî divêt, azadî divêt, aştî û wekhevî û rastî divêt. Hevalînî û hevbendî û peyman bestin bo hîngê dibaşin wekî mirov yek bit û yê bi hêz û şiyan bit.

Dîmukrasiya bi lez û bez ne ya başe bo piraniya dewletên cîhana sîyê. Yan jî divêt xelkê wan dewleta di naveroka wê dîmukrasiyê bigehin, û serkêşên wan bihêna bi xudan kirin li ser şol pêkirina dîmukrasiyê di gorepana xebatê da.

Milletê kurd yê divê heyamê da dibорit û yê xwe amade dikit bovê çendê.

Ew çi dîmukrasîye ya hindek rêkxistinên kurdî dixwazin bo wan rijêmên Kurdistan li ser xwe lêkvekirî, daku "otonomiyê rast û dirust" li bin sîbera wê bijît.Û ew rêkxistin bi xwe dizanin ku çu destelatdarî di destê gelê meda nabit.

Aya li demê nuhe yek nimûna dîmukrasiya bi dirustî di nav hemî dewletên rojhelata navîn da heye?

Aya kurd dikarin wê dîmukrasîyê li Îraqê ava bikin daku efsana otonomî biparêzin?

Piştî her karesateka bi ser serê gelê me da hatî gelek rengên got gotka û egera me gulêbûn û hatine gotin. Piştî karesata 1975 ê gelek axiftin hatine gotin li ser pîlana împiryalîzma Emrîkî, pîlana Ba'sa Îraqî û şahînşahî û pîlana Cezayrê û Urdinê û Misrê dijî pirsa gelê kurd. Û piştî karesata supayî, yan ya politîkî li sala 1988 ê axiftin li ser bê destelatiyê beramber çekê şîmyayî, gelek hate vecwîn, lê me çu gulê nebû derbarey berellayîyê û nesaxiyên nav xwe û şerê bira kujiyê, nexasme di salên cengê Îraqê û Îranê da.

Xelkê Kurdistanê dipirsin û mafê wane bipirsin: Aya serkêş û serokên kurda çi kir û çi pêşkêşkir wekî dwîkêla cengê Îraqê û Îranê di çû ber esmana..? Û herwan serkêşa çi da herdu rijêma li Îraqê û Îranê her di wî demî de? Aya xudê hîç perdek danaye ser çavên xelkê me daku çu ronahiyê nebînin...?

Feylesofê Îdyalîstê yonanî "Aflaton" î di komara xwe ya îdyalîst da derbarey wan yê peyivî ewên mayne di şkefteka tarî da û dest û pê lê girêday û piştên wan li derê şkeftê. Paşî pîştî dest û pên wan veboyn û ji şkeftê derkeftîn nekarîn çavên xwe li ber tîrojka tavê vekin. Lê piştî hîngê hêdî hêdî çavên wan hî bûne tîrojka rojê û şiyan vebin.

Ew bizava stiratîjîkek nebit, tektîkek nîne. Û bizava tektîk nebit heval nînin. Bizava hosa herdem dê li bazarê kirîn û firotinê û koştinê da bit. Yariya gelan pêdivî suwarên çeleng û zîreke ku bişên xwe di ser astengara bi havêjin, û di hevpeyivîn û dan û standinê bigehin. Eger

bidey û nestînî, yan pitire ji wergirtinê bidey, hîngê behra te dê her bindestî û bendegî bit.

Kêşa azadbûna milletê kurd li hemî parçên Kurdistanê ji kêşa êmnahiya neteweyî ya Kurdistanê nahête vavartin û cuda kirin. Du kêşene lê hevpişkên êk çarçovene. Û bêy diyarkirina êmnahiya neteweyî ya kurd û Kurdistanê çu armanc xuya nabin û nahêne diyarkirin.

Hindek rêkxistinên Kurdistanê pêdivî gogirandina bîr û bawer û têgehiştina xelkê Kurdistanêne. Lê ta çi tuxwîb, yan ta çi radde ev rêkxistine, evên aşkera di gorepana xebatê da şiyane têgehiştina neteweyî ya endamên xwe bi gogirînin û biken têgehiştina komelayetî.

Dibit vê pirsyarê bersiva xwe hebit eger em li rûdanên xwînawî û netebayî û şerê bira kujiyê binêrîn û her wesa ne rohniya stiratîjîya politîkî û supayî ya bizava azadîxwaza kurdî bideyne berçavên xwe lewma dibêjîn bêy têgehiştinek pir fireh û rind neşêyn di serbestîyê bigehîn bi hemî rengên wê ve yên politîkî û aborî û civakî. Û dîsa nikarîn şol pê bikeyn ne di serkeftinê û ne di şkestinê da.

Axiftina xweş û nerm baştirîn loqeye bo ava kirina aştiyê mirov yê xudan hêz û şiyan bit.

Yek ji mezintirîn hele û nedirustiyên şorişa me ya hev çerx eveye di neqşê supayî yê hêzên şorişê da xwe berhevkirin ya mişebû ji bo cengê sîng û sîng li ser binyatê stiratîjîkên kevin.

Hindek hêzên supayî yên şorişa kurdî ta nuha jî hizra xwe di hindê de dikin da bajêrkekê biçûk yan çelekî li hindav gundekî rizgar bikin û bihêlin di destê xweda.

Bikarne înana loqê partî zanî li nav gunda, û nebûna serborên şerên nav bajêra, û berzebûna pêdiviyatên aborî, û saykolojî di neqişkirina stiratîjîkîda, pwîte pênekirina bi

egera ciyopolitîkî; şorişê du dil dikit û di tirsînit. Lew nikarit hêza dijminî ya politîkî û aborî û saykolojî bimêjit û bikujit.

Axiftina azad pwîte pê nehatiye kirin, û hindek serkêşên kurda ditirsin hindek rêkxirawên dîmukrasî yên kurdî bi azadî li nav cîhê rizgarkirî bilivlivin. Ev bizave bivî rengî dê di xizmeta rêkxirawetiyê da bit ne di xizmeta millê kurd. Û eger berjewendiyên milletî hatine ji bîrkirin azadî jî peyda nabit.

Yek ji egerên lawaziya bizava azadîxwaza Kurdî tirsyane ji guhorîna peywendiyên civakî, û aborî di ser hindêra ku şorişa kurdî ya peyda boy ji bo vê çendê.

Xebata azadîxwaza kurdî bi hemî rengên xweve, dê di xizmeta rizgar bûnê û nehêlana kedxwariyê da bit. Hindek rêkxiraw û rêkxistinên kurdî li nav deverên Kurdistanê yên rizgarkiri ji bo dîmukrasiyê xebatê dikin. Lê ew bixwe di nav xweda dîmukrasiyê bikar na înin û nikarin li nav deverên rizgarkirî jî bikarbînin!. Pa ew çi dîmukrasiyete ya xebatê bo dikin..?

Hêrişên dijmina gelek di har û dirindene li ser bingehên şorişa kurdî li nav hemî parçên Kurdistanê. Wekî ez dibêjim şoriş, ne mebesta min bitinê helgirtinda çekiye. Çunkî şoriş ne bi tinê hindek mirovên çek helgir û şerkerin. Lê şoriş karek pir mezine, karê rîzgarkirinê û guhorînê ye ji hemî alave, ji bo xizmeta çînên jar û tepeser.

Di ser hindêra ku milletê kurd gelek mêrxas û şerkerên xwedan serbor û pir zîrek û çeleng yên heyn, lê dijmin gelek sûdî bo xwe ji lawazî û ji ber yek çuna gelê kurd wer digirit. Çunkî berokên politîkî ne şiyane başiyekê bidine destê xelkê xwe.

Peywendiyên tektîkî di gel hindek wan rijêmên Kurdistan dagîr kirî yên boyne stiratîjîk. Û nebitinê eve lê hindek

serokên kurda hevrikîyê di navbera xweda diken; ka kî dê pitir şêt xwe nêzîkî wan rijêma kit, û dostîniyê di gel girêdit.

Lê di amade nînin dostînî û peywendiyên birayîniyê di gel rêkxistinên Kurdî yên dî bikin li parçeka dî ya Kurdistanê.

Behra pitir ji şorişên kurdî ne li berokên cengê şkestîne, û ne ji egera supayî veçixîne. Lê di warê politîk û aborî û civakî da yên şkestîn û bi paşda çoyn.

Herçende şorişa kurdî ya hevçerx li Kurdistana Îraqê û Îranê di warê supayî de bipêşketin li demê cengê Îraqê û Îranê. Lê neşyan di politîkê û karîda bipêşkevin.

Eger bi rastî bit ew rêkxistina hêzek supayî mezin hebit li her parçeka Kurdistanê, eger kesên bîr tîj û viyana hemî xelkî di gel nebit, dibit di helbijartineka dîmukrasî ya serbest da şkestê bixon. Çunkî hêza politîkî hêza serekiye, û hêza supayî bi tinê parçeke ji stiratîjîka politîkî

Tiveng bi xwe neşêt xwe bihelbijêrit, lê politîk û jîrkarî ye wê heldibijêrîn. Tiveng bo berdewamiya jîrkariya politîkî başe.

Dîrok ya pirre ji bermalk û şînwarên milletên kevin û here mezin yên pwîç boyn ji ber ku gelek direng li kêmasiyên xwe zivirîn, lewma wêran bûn û neman.

Bo gellê kurd jî nezwîye ji xwere stiratîjîkeka politîkî ya rast û dirust bibînît û li ser biçit, û hemî şiyanêt (îmkanêt) xwe ji bo terxan bikit, da ku vê gefa (tehdîd) wêrankirinê û nehêlanê û girrkirinê ji ser xwe bi helînit. Eger pwîtekê (îhtîmam) giring bi vê çendê nehête dan, bila her ji nûke giriyê nemana xwe bikîn. Çunkî ew perê nezanînê ye û cihê daxê ye em nezanîn bo xwe sûdî (faydey) ji warê xwe û kawdanên xwe wergirîn.

Gefên ku li milletê me dihêne kirin di pir bivene û pir mezinin, nexasme di vî demî da. Dijminên me yekin eger rengên wan jî yek nebin. Lê derbarey pirsa kurdî hemya yek bîr û bawer ya hey û bin gorkirina vê pirsê dixwazin, û ji bo vê çendê gelek bi tundî kar dikin, û dîroka me pirre ji van nimûna.

Peywendiyên şorişa kurdî ya Îlonê di gel şahînşahê navê (Aryamîhr) danaye serxwe wate "berevanî ji ariyan" çi lê hatin û çi dumahî he bû..? Karesata 1975.

Berhemê peywendiyên hindek rêkxistinên kurdî di gel rijêma Xumênî û rijêma Seddamî çi bû..? Bira kujî li navbera rêzên pêşmergê bizava azadîxwaza Kurdistanê da li parça jêrî û rojhelat, û mişextbûna pitir ji sed hizara ji kurda bo Îranê û Turkiyê, nexasme piştî rijêma Seddamî çekê şîmyayî bikar înay.

Dîroka mirovayetiyê dîroka şerenîxêye ji bo serbestî û desthelat dariyê.

Olperistî, (diyanet) çu çara bo kovanên kurda nabînit û birîna kurda derman nakit. Bi tinê olperistî dikarit peywendiya mirovî di gel Xudê diyar bikît. Lê ji ber ku ol perîştî şoleke bi mirovîve girêdaye pêdiviye rêz lê bihêt girtin wek mafek ji bo xizmeta komelgahî. Pileya bilinda tepeseriya birayên xwe, kurdên êzdî ji bîr nakîn. Tepeseriya wan pir tahl (tal) û pir mezine, ji alê aborîve wek hejar, ji alê olperistî ve çunkî êzdîne. Lewma busilmanên kurd û ereb herdem berdem êş û nexweşiyên gehandînê û zordariya lê kirî. Herwesa em jêrdestiya (çewsandina) birayên xwe yên fele ji bîr nakîn, nexasme aşorî û siryan û kildan û Ermena.

Hindek xudanên şaşkên spî û reş xwe bi sîbera Xudê di niyasin û gazî diken û dibêjin. Li bin perda dînî çu mafên neteweyî nînin. Dixwazin milletê me binavê olpe-

ristiyê girê bidin. Lê olperistî ne şîreke li hindav stoyên xelkî.

Netebayên me ne bi tinê di politîkî û aydyolojîne, lê her wesa netebayên saykolojî û stiratîjîne. Çunkî ta nuhe bizava azadîxwaza kurdî lîsta mafên xwe bi dirustî diyar nekiriye, û binyatê komkirina şiyan û rêkxistinên xwe ne danaye, û bi dirustî dujmin û hevalên xwe jêk nevavartîne, û loqê berhingariya dijmina ne li Kurdistanê û ne li gund û bajêrên dijmin bixwe, ji xwere ne gogirandîne di çarçova êmnahiya neteweyî da.

Hizir di neqşê peywendiyên xwe di nav xwe û derve da nekiriye, herwesa hizir di pêdiviyatên şorişê û şorişgêran da nakirîye. Şoriş nehatiye program kirin, û warê (cihê) wê li nav rêza bizava azadîxwaza gelan û sîstema cîhanî da nehatiye diyar kirin.

Netebayî di nav rêzên bizava azadîxwaza me da lawazî û bê şiyaniya me berçav û mezin dikit û xelkê me ji gorepana xebatê di revînit û didite paş, û mişextiyê mişe dikit û birînên me pitir û pitir kwîr dikit.

Rêkxistinên kurdî û Kurdistanî di pirin di gorepana xebatê de û herwesa li dervey gorepana xebatê. Hemî jî hêviya azadkirina xelkê xwe heldigirin û şorişgêra dizoxînin û paşî wê zoxandinê çik dikin û divemirînin bi hêrişên pirûpagenda dijî yek û du. Hemî dibêjin Kurdistana me yeke û dijminên me tuxwîbên bi dest çêkirî yên êxistîne di nav meda. Lê kes ji wan pêngavekê nahavêt ji bo yekbûna kurda, daku hemî rêz bibine êk, û hemî şiyan biçne serêk, û armanç û stiratîjîk bibne yek. Herwesa hizir hemî bikevine yek kolan û wekî yek mêzdene pirsa xwe.

Hindek rêkxistin hizra damezrandina dewleta neteweyî ya kurdî di înine pêş, û hindekên dî li ser mafê çarenivîs û serxwebûnê di peyivin. Hindekên dî hizra mafê çarenivîs û yekbûna dilxwaz berçav dikin. Lê hindekên dî hizra otonomî yê "rast û dirust" berçav dikin. Hindek rêkxistin jî yên heyn bitinê li ser mafên neteweyî ji bo gelê kurd dipeyivin bêy ku wan mafa diyar bikin. Hindek jî, ji bo mafên <<rewşenbîrî>> bo kurdan dixebitin. Hindek rêkxistin yên heyn dibêjin kurd mêvanên Sovyetiya ne û hemî mafên xwe yên heyn. Hindekên dî dibêjin gelê kurd ji alê neteweyive yê tepesere li Kurdistana yekêtiya Sovyet, hindekên dî yekbûna fêdralî dixwazin!! Û hosa ta dumahiya vê efsana xembar û rondik (hêstir) barîna politîkî.

Ew hizrên me di zivirînin û kar di meda dikin cudahiyê têxine di navbera meda pitir ji ku me bigehînine yek. Em yên di heyamê (qonax) azadbûna neteweyî û niştimanî da. Hêzên politîkî Markisizmî pêşkeftin xwaz yên heyn. Û hêzên politîkî Marksizmî-Lenînizmî yên pêşkeftinxwaz jî yên heyn. Û hêzên politîkî lîbralî û hêzên politîkî yên xwe parêz û hêzên paşve ro, û hêzên ji pêşkeftinxwaza jî "pêşkeftinxwaz tir".!!

Û bombayên jehrawî û şîmyayî yê di barine ser serê me û Kurdistan ya dibite agir û di sujit, û barega û binkên me yê li Bexda û qelemgahên me yê li şamê û tîpên pêşmergên me yê li Tehranê û peykên (mendûb) me yê li Enqere û partên me di nav Kurdistanê da ji yek di belav û pirt pirtin, û hejar û karker û cotkarên me herro yê xwîna xwe ya germ û hêja dirêjne ser axa dêrîna Kurdistanê, û mafên me di xwarîne û dibê beşîn, û erdê me yê li ser biyaniya û dijmina lêkvekiriye, û milletê me yê ji ber yek çoy û şepirzeye, û serkêşên me jî her ewin û

nahêne guhorîn û her yê li cihên xwe. Armancên me di pîroz û kwîrîne (wehmî), û hizrêt me di paqij û berzene, û herroj em soza xwe nwî dikin ku vê rê bernadîn, riya serferazî û azadiya Kurdistanê. Bêy ku sûdekê boxwe ji dîrok û serborên xwe wergirîn.

Îro milletê me yê keftiye bin barê xebatê û serheldanê û yê raboye serxwe. Lewma pêdivi hizrêt geş û hêja yên neteweyî û civakî ye, hişyar bibin, da hêvî û daxwazên vî milletî bi hêne bi cih înan hêşta ev rabûne sist neboy û xav neboy.

Rizgar bûna me ya bi dirustî ya di serxwebûnê da alayên serbestiyê li ser gopîtka hemî çiyayên Kurdistanê bihejyên, û dilên hemî zaroka xweş bibin, û bi viyana mezin bihêne lêdan, û aştî bibite kirasê here ciwanê welatê me. Û her daykeka kurê xwe gorî serbilindî û serferaziya milletê xwe kirî rondikên dil xweşiya Kurdistanê biwerînit.

# -JÊDER-


-Bedlêsê, Şerefxan. Şerefname. Wergêrana Hejar 1972ê.
-Raporta Politêkê ya P:D:K-Îraq ya li konferansa partî li sala 1976 ê hatiye pêşkêş kirin.
-Bî xofiskî. B.kes û civak. Wergêrana Hinrî Riyaz. Çapa duwe. Bêrût. Kanûna duwê 1978 ê.
-Rojnama Enwar ya Bêrûtî 20 î Îlona 1975 ê.
-Şamilof. A. Derbarey kêşa derebegîyê li nav Kurda. Wergêrana Dr. Kemal Mezher Ehmed. Çapxana Zeman. Bexda 1977 ê.
-Wanlî Usmet Şerîf. Derbarey Stiratîjîka politîkî û su payiya bizava azadîxwaza Kurdî, dîtinek bo demê borî û demê nuhe, yek jî bo paşe rojê. Kovara nivêsînên kurdî jimare 2 Parîs 1975 ê. Ênstityuta Kurdî.
-Lênîn. F. Witarek (gotarek) derbarey rwîmeta neteweyî ya Rosan. Helbijartî (muxtarat). Pişka yekê û duwê. Mosko 1971 ê.
-Lênîn. Îskira. Jimare 44. Ji nivêsîna derbarey pirsa nete weyî. Wergêran û pêşkêşkirina Coric Terabîşî. Çapa yekê. Dar El-Telî'e bo çapkirin û belavkirinê. Bêrût. Tîrmeha 1972 ê.
-Lênîn. Neqşek bo berçav kirina pirsa neteweyî. Nivêsînên tevav. Pişka 41 ê ji nivêsînê derbarey pirsa neteweyî.
-Lênîn. Pirolîtariya şorişgêr û mafê çare nivîsê milletaha tiye wergîrtin, ji nivêsînên derbarey pirsa neteweyî. Çapa yekê. Bêrût. Tîrmeha 1972 ê. Dar El-Telîe.
-Manwêl, warnist û Rûdinon, Meksîm. Netewe û şerenîxa çîna. Ji kitêba got û bêja çîn û millet. Wergêra-

na Corc Terabîşî. Çapa yekê. Bêrût. Uktobera 1974 ê.
-Mehemed. Mesûd. Zivirandina hevsengiyê (tewazin) bo teraziyeka alîseng. Korî zanyarî kurd-Bexda 1977 ê.
-Morginthau Hanz. Politîk li navbera milletan, pişka yekê. Wergêrana Xeyrî Humad- Qahîre 1964 ê.
-Nîkson, Rîtşard. Aştiya bi dirustî. Wergêrana Riyaz El-Tebbai. Çapa yekê. Şam 1985 ê
-Hirtiz, Firidrîk. Netewayetî di dîrok û politîkê da. Wergêrana Ebdulkerîm Ehmed. Bi serda çona Dr. Îbrahîm Seger. Misir 1968 ê.
-Heykel. Mehemed Hesenên. Çareserkirin û Ceng. Çapa yekê -Bêrût- Libnan. 1977 ê.

# TÎVARÊZ

* Daku bîzanî mebest ji otonomî çiye? Kitêba me: (Mafên neteweyî yên gelê Kurd di destûrên Îraqê da) bixwîne.
** Daku bi dirustî karê egerêt derve li ser şorişa kurdî li Kurdistana Îraqê, bizanî Kitêba me ya ku bi zimanê Siwêdî hatiye çapkirin li sala 1988 ê bixwîne. Berperê 54-62 ê.
Navê Kitêbê,
-Den Kurdisk-Irakîska Konflikten. Bokforlag, Kitabiat, Sigtuna Sweden.
*** Ji bo zanîna dirêjiya babetê cudabûnê kitêba me ya di tîvarêza yekê da nav lê hatî înan bixwîne.

# Ferhengok, ji bo bi sanahî kirina peyvên giran û nuh

1-Li pey : Li dwîf, li gor, be corey. (Wîfqe-E)
2-Loqe : Îslûb
3-Neteba : Dijkî, nakokî, ne hemnahî, (tenaquz-E)
4-Kartê kirin: (Teisîr-E)
5-Jîrkarî: Eqilkarî, (eqlaniye-E)
6-Kawdan: (zuruf-E)
7-Heyam: (Merhele-E)
8-Borîn: Têdaçon, (mirar-E)
9-Sermayedarî: Diravdar, (reismaliye-E)
10-Di mişene: Di zehfin, di pirin, gelekin, zorin.
11-Amwîr: (Edewat-E). (Alat-E)
12-Kawdanên xweyî: Kawdanên naxweyî, (El-zurof El-zatiye-E)
13-Hebandin: (Hezim-E)
14-Kawdanên derve: (El-zurof El-xariciye-E).
15-Yasa: Qanûn.
16-Komeldarî: Civakî, (Îctîmaî-E).
17-Pelose: Sist, xav, ne mukim.
18-Twîxe: (Tebeqe-E)
19-Weriz; Demekê salê, mewsim.
20-Mîrî: Hukomî, dewletî.
21-Karsazî: (Muesesat-E)
22-Cwîn: Pişk, qismet, (qisim-E)
23-Dirav: Pare, pûl, (niqûd-E)
24-Nan û Zik: Şolkirina bê kirê.
25-Fişar: Vegivaştin. (Zext-E)
26-Xwîk: (Zerîbe-E)
27-Hî û şî: Adat û teqalîd.

28-Pile: (Derece-E), numre.
29-Duser: (Mizdewec-E).
30-Bendegî: (Ubodiye-E)
31-Go pîtik, serê çiyay, (Qumme-E), lûtke.
32-Babetyar, (Mewzoî-E), Objektîvî.
33-Peqîşk: (Fuqaat-E).
34-Sûrbûn: (Îsrar-E).
35-Xwedxwahî-F: (Enaniyet-E).
36-Wate: Mana
37-Nakokî: Xîlafat-E)
38-Bê pwîteyî: Îhtîmam pê nekirin.
39-Hest: Sû ûr.
40-Qutbir: Kuştina bi tevayî. (Îbade-E)
41-Serkirdayetiya katî: Qiyada mueqet.
42-Şepeşer: Fewza-E
43-Hevbend: Helîf-E.
44-Su: Şek-E.
45-Hemberî: Musawat-E.
46-Komgah: Sazîman, Heye-E.
47-Rol: Dewr-E.
48-Sihûsyatî: Tecesus-E.
49-Varê: Di ser rêda çoy.
50-Sîstemyar: Nîzamî-E.
51-Kêşe: Muşkîle-E.
52-Karmend: Muwezif-E.
53-Gef: Hereşe. Tehdîd-E.
54-Mişkanê: Murahene-E.
55-Cora û cor: Gelek tuxim, muxtelif-E.
56-Hizret: Hirman-E.
57-Nîgah-F-: Temaşe kirin, berê xwedaneka sivik. Nezre-E.
58-Heman: Her wî.

59-Mêtin geh: Muste´mere-E-
60-Ho: Tebrîr-e.
61-Nojdarî: Pizîkşkî, tobbî-E-
62-Sexlet: Sîfat-E-
63-Winda: Berze, Bizir.
64-Jêder: Ser û Kanî, serçawe, Mesder-E-
65-Çonyetî: Keyfiye-E.
66-Jibirî: Feal-E-, efektîv.
67-Liçik: Peyt, amade.
68-Helsengandin: Teqyîm-E-
69-Berpirsî: Mesûliye.
70-Pêve nwîstî: Pêve ristî, Multesîqe-E- pêve çespî.
71-Komgîr: Neqabe-E-
72-Bêş kirin: Xirve kirin, komkirin.
73-Zak: Gorepan, meydan, sahe.
74-Gogirandin: Tebilwir-E-
75-Encomen: Meclis.
76-Sinûr, Merz, Tuxwîb.
77-Di herimînit: Pîsdiket.
78-Çeng: Dest, lep.
79-Pêşwazî: Çona bi pêşve. Îstîqbal-E-
80-Dem: Kat, wext.
81-Zoxandin; Tehrîz.
82-Ingilistan: Ingiltera-E-
83-H.t.d: Heta dumahîkê.
84-Birî û nebirî: Fayde û xusaret.
85-Lehend: Cihê şêr lê dinivit. Mala şêrî.
86-Bi cahirî: Şwîna, leciyatî.

Têbînî:
E-Erebî
F-Farisî.

***Berhemên Xalid Xalid-Koçî yên heta niha çapkirî:***

1-Partîyên siyasî yên Iraqê.
*Çapxana Xebat. Kurdistan. 1973 (Arabî)*

2-Den Kurdisk Irakiska Konflikten.
*Bokforlag Kîtabîat-Sweden. 1988. (Swêdî)*

3-Berê xwe danek di karêt netebayên pirsa kurdî û pêdiviyatiyên nuhe.
*Apec-Tryck och Förlag-Sweden (Arabi 1989)*

4-Dal, Şêrko Bêkes. Wergerandin Ji tîpên Erebî bo Latînî.
*Apec-Tryck û Forlag. Sweden 1989 (Kurdî)*

5-Çawa qanûnên Bingehî yên Iraqê behsa mafên milletê kurd dikin?
*Ararat Tryck-Sweden. 1990 (Arabî)*

6-Siyaseta Sovyetî di Derheqa pirsa kurdî da.
*Ararat Tryck-Sweden. 1990. (Arabî)*

7-Kurte welamêk le ser pertûka Fadîl El-Berak "Barzanî le Nêwan efsana û rastî" da.
*Apec-Tryck û Forlag, Sweden, 1992 (Kurmanciya Jêrîn-Soranî).*

BERÊ XWE DANEK DI KARÊT NETEBAYÊN PIRSA KURDî Û PÊDIVIYATIYÊN NUHE

**Xalid Xalid-Koçî**

ISBN: 91-630-1238 - 3